

## Êrîşên DAIŞ'ê û palpiştên wê

Di van demê dawî de li Iraq û başûrê Kurdistanê li ser hev êrîşên DAIŞ'ê çêbûn. Ev êrîş bi giranî li dijî noqteyên pêşmergeyan çêbûn. Li ser van êrîşan ne hikûmata herêma Kurdistanê û ne jî hikûmeta navendî... ***Felemez Ulug / R.6***



## Pedagojiya zayenda azad

Peyva pedagojiyê bingeha xwe ji yewnaniya kevin digire û tê wateya 'perwerdekirina zarokan (wê demê ji bo zarokên kur), birêvebirin û lênerînê'. Di dema antîk de ji kesên kole/dîl re, yên ku zarokên kur di çûn û hatina rêya... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***



## "Fast-think" an Muhendîsiya ziman

Peyva "fast-thinkers" ji aliyê Pierre Bourdieu ve hatiye bikaranîn. Ji bo "fikirdarên ku hema zû bi zû û bêyî kûrahiyê ve li ser tiştan dipeyivin" tê bikaranîn. Yanî hayê wan baş ji meseleyê nîne, lê dikarin bi saetan behsa... ***Îbrahîm Seydo Aydogan / R.5***


# xwebûn

13-19 KANÛN 2021 HEJMAR: 104 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


## Çima Şengal?

Bi giştî di serdem û dîroka civaka êzidî de û heta niha kurdên êzidî li hemberî komkujî û kuştina kesayetan rû bi rû ma ne. Piştî êrîşên dewleta tirk li ser nexweşxaneya Sekîniyê di 17'ê tebaxê de komkujiyek pêk hat û di encamê de 8 welatiyan jiyana xwe ji dest dan. Dîsa berî çend rojan bi êrîşeke hovane Hevserokê Meclîsa Rêveberiya Xweser ya Demokratîk a Şengalê Merwan Bedel û zarokên wî hatin qetil kirin. Dema em rewşa Iraqê ji başûr heta bakur di ber çavan re derbas bikin, em dibînin tê de gelek hêzên herêmî û navnetewî bernameyên xwe henin. Her yek ji wan dixwazin bi rêya piştgiriya... ***Serdem Silo / R.7***

## Garîbe Gezer ameye kiştene

Roj çina ke zîndananê Tirkîya ra xebera teda, binpaylerdişê heqê merdiman, îşkence, tacîz, tecawuz û ûsn. nêra. Vera tepişteyê camêrdan de polîtîkayê cîya û vera cinîyan de zî polîtîkayê cîya cîyayî yenê rayraberdene. Nameyê îşkencekaro zilmkar ê bi name û veng ke dima ra ame cezakerdene Esat Oktayî hema zî goşê her merdimî de zimeno. Zîndanê Tirkîya de no merdim sey mînak yeno dîyayene. O wext zilmê Oktayî vera xeylê tepişteyî xelisnayîş grevê vêşanîye ê mergî, çalakîya adir verayîşê bedenan û çalakîyê fedaî de dîyî. Her çend ke şexs bibedelîyê zî zîhnîyeto zilmkar hema... ***Valere / R.9***

## Siwarê hespê xelkê her peya ye


Aboriya Tirkiyeyê ji ber daxwaz û pêkanînên Erdogan, weke desthilata wî av û av diçe. Hin caran av û av çûyîn baş e. Ji bo kesên ku bi avê de diçin dibe paqijî. Lê ev ji bo AKP'ê û Erdogan qet ne baş e. Ji ber ku pergala ku ava kirine her derî dilewitîne. Lewre destê xwe diavêjin çi hê bêtir gemarî dibin û rengê xwe baştir didin der.
Ji bo ku ji vê rewşê rizgar bibin, ji xwe re papilûkek (Bahçelî-MHP) dîtine. Lê çi heyf! Ev papilûk ji cemedê ye, kêlî bi kêlî dihele û li gemara wan zêde dibe. Êdî kî rê li ber wan xistibe û ji wan re bûbe keştî bi vê gemariya xwe li qiraxa welatên kendavê... ***Kadrî Esen / R.8***

# Wêneyê mafên mirovan

✓ Di hefteya mafên mirovan de li aliyekî binpêkirina mafan, li aliyê din têkoşîn derket pêş. Li girtîgehan tecrîd giran dibe. Li dijî wê têkoşîn pêş dikeve.

✓ Ji girtîgehan cenaze derdikevin. Nexweş nayên berdan. Girtin, kuştin, tecawiz, dizî, talankirin û qeyrana aborî kûr dibe, xweza tê wêrankirin.

✓ Li hêla din li dijî tecrîd, îşkence, girtin û kuştinê di pêşengiya dayikan de li Riha, Amed, Sêmalka û Wanê Nobeda Edalet û Azadiyê berfireh dibe.















## Xizaniya Başûr dewlemendiya Barzanî

Di rojên dawî de li başûrê Kurdistanê xwendekarên zanîngehan ji ber hikûmet mûçeyê wan nadin, çalakiyên girseyî li dar xistin. Bi hezaran xwendekar daketin kolanan. Piştî çalakiyên xwendekarên zanîngehê, rojnamegerê amerîkî Zack Kopplin, li ser mal û milkê malbata Barzanî lêkolîn kir. Di encama lêkolînê de Kopplîn, mal û milkê veşarî yê malbata Barzanî bi belgeyan derxist holê. Rojnameger Kopplin di gotara xwe ya bi navê 'Cowboy Drugstore' (Dermanxaneya Kovboy) de ku di rojnameya The American Prospect'ê de Xanûmanên li Kaliforniya û Virginiayayê jî di nav de bigiştî buhayê 75 milyon dolar 4 mal û milkên veşarî yên li DYA derxist holê. Rojnameger Kopplin anî ziman ku ev mal û milkê malbata Barzan... ***R.7***

FATMA TAŞLI TUNÇ

## Kundirê dimsê û şivanê kulekan...

***R.10***

## Alîkariya kapîtalîzmê

Di cotmehê de xwediyê şirketa Amazonê Jeff Bezos li ser hesabê xwe yê twitirê got: " Ez gelekî bi kelecan li hêviya dîtina leystika (Squid Gamê) me". Rêzefîlmê (Squid Game) ku şirketa Netflix a Koreya Başûr weşandibû û piştî mehekê ji weşanê 111 milyon kesan lê temaşekiribû. Bi gotineke din li gorî hejmara dîtinan ew di rêza yekemîn de bû. Wekî tê zanîn ew rêzefîlmê ji 9 xelekan pêk tê, rexneyan li civaka kapîtalîst dike... ***R.11***



## Bajarê medan yê winda

Bavê dîrokê Herdot ê Îonyayî di berhema xwe ya giranbuha ya bi navê Dîrokê de, qala bajarekî medan yê li Anatolyaya navîn dike. Navê xwe Pterîa/Pteriya ye... ***Agît Yazar / R.12***

## Ev pergal li gorî rengê civakê ye

Ev pergal li gorî rengê civakê ye Ji bo zanebûnên der barê pergala darizandinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, me pirsên xwe ji hevseroka Yekitiya Parêzerên Cizîrê, parêzer Xedîca Ibtrahîm kirin. Ibrahîm di bersivên xwe de behsa çawaniya darizandinê, cudahiya vê pergalê ji pergalên din ên Sûriye û welatên derdorê û behsa pîvanên darizandinê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir. Tu dikarî ji kerema xwe hinekî behsa pergala darazê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikî? Kengî û çawa hate damezrandin?Pergala edaleta civakî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jixwe pêşî li Rojava dest pê kir. Piştî şoreşa 19'ê tirmeha 2012'an hat avakirin. Wê demê valahiyek çêbûbû, rejîma Sûriyeyê ji herêmên kurdan hate derxistin... ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî / R.6***



Biyan
Munewer Azîzoglu Bazan

# Pedagojiya zayenda azad

Peyva pedagojiyê bingeha xwe ji yewnaniya kevin digire û tê wateya ‘perwerdekirina zarokan (wê demê ji bo zarokên kur), birêvebirin û lênerînê’. Di dema antîk de ji kesên kole/dîl re, yên ku zarokên kur di çûn û hatina rêya wan a dibistanê de hevalrêtî dikirin, pedagog dihat gotin. Dû re bi giştî ji perwerdekarên zarokên kurîn re pedagog tê gotin.

Ji sedsala 18’mîn şûndetir peyva pedagojiyê bi taybetî di beşên feylozofî û teolojiyê de tê bikaranîn û heta roja me ya îro jî bi giştî di wateya zanista pêvajoya perwerdekirin û xwedîkirina mezin û biçûkan, bi giştî mirovan tê bikaranîn. Ji serdema ronakbîriyê heta endustriyalîzmê, ji olan heta bîrdoziyên cûrbecûr her pêl têşeya pedagojiya xwe jî bi rê, rêbaz û rêzikan diyar kirine.




Lê ew ê çarçoveya vê nivîsê li ser pedagojiya femînîst be. Her çiqas hemû pedagojiyên ku li ser civakan û pergalên wan bandorên xwe kirine, ji têkiliyên zayendî û bi taybetî jî yên baviksalar azadtir nikarin bên şîrovekirin jî, ez ê hewl bidim ku hin ji wan ji perspektîfa femînîst binirxînim.

Pedagojiya femînîst ku wek tomara nêzikatiyên cuda yên ser esasa perspektîfên jinan dikare bê dîtin, serê xwe ji bo -di her qadê civak û jiyanê de- azadî û wekheviya jinan û her wiha rêzgirtina cudahiyan diêşîne. Mijara azadî û wekheviya jinan –divê êdî hewcê dubarê nake- di hemû kêliyên jiyanê de xwe dide nîşandan. Ango çi derê ku mirov xwe li wir civakî kiriye, ev mijar xwe dide der. Pedagojî jî wekî dîsîplîneke ku bingeha xwe ji teorî û pratîkên pergalên heyî distîne, bê têkiliyên zayendî nikare bê destgirtin. Lewre dualîkirina zayendan, hîyerarşîkirina zayendan, dîtina wan a neguherbar û xwezahî di teoriyan de tê diyarkirin; bi rêya zagonan ev wek rêbaz di nav civakê de tên birêvebirin, bi rêya perwerdê û pedagojiyê jî di nav civakê de û di kesayeta mirovan de (mezin, biçûk, hemû zayend) xwe didin der û bi vî awayî ji bîrdoziyeke zîhnî rastiyeke fîzîkî tê avakirin.

Serdema ronakbîriyê di avakirina têkiliyên zayendî yên hîyerarşîk de ya herî bi bandor e. Taybetî teorîsyenên wek Rousseau, Campe, Pestalozzi bi nivîs û nêrînên xwe yên derbarê têkiliyên jin û mêr de bingeha ‘îdeolojiya pedagojiya zayendan’ avêtine. Ev zanyarên mêr ên civakî yên dema xwe wêneya jin û mêrên îdeal a civaka rojavayî pênase kirine. Her çiqas di hin hûrbûnan de ji hev cuda formulekiribin jî aliyên wan ên hevpar ew e ku hemû jî jinan wek zayendeke nîv mirov ku ji bo mêr û zarokên xwe dijîn, xêz dikin. Lê ev hiyerarşiya zayendî wisa bi awayekî tenik û zirav tê şîrovekirin ku jin bi xwe jî taybetiyên ku ji bo wan hatine sazîkirin, rast û xwezahî dibînin.

Li gorî van camêran civaka îdeal ji du zayendan û peywîrên wan ên dabeşkirî pêk tên. Dema ku mêr bi taybetiyên xwe yên rasyonel, çalak, baqil û bi hêz li qada hilberînê û vekirî tê bicihkirin, jin bi taybetiyên xwe yên hestiyarî, xwezahî, bêhêzî, xwegorîkirinê li qada jinûvehilberînê û li malê tê bicihkirin. Lewre dîsa li gorî wan jin bi hesasîbûna xwe, nazikbûn û narîniya xwe ne gorî qada hilberînê ye, ne gorî rasyonalîteya cîhana mêran e. Ev dualîkirin ji bo ‘yekbûn’ê û ‘hevseriyê’ pêwîst e. Jin mêr temam dike, mal qada vekirî temam dike, hestiyarî rasteqîniyê û lênêrîn jî hilberînê temam dike. Ev yekbûn û hevserî di xizmeta mêr de ye. Lewma jî jinan wek ‘zayenda bi exlaq’ (moral) pênase dikin. Qaşo jinan dikin navenda ‘civaka baş’, ew bi taybetiya xwe ya gorîbûnê ku ji bo mêr, zarok, civak amade ye dev ji xwe berde, ji bo berjewendî û pêşeroja civakê ‘zayenda pîroz’ e.

Bi rastî ev nêzîkatî ji hêla jinan ve jî tê (dihat) pejirandin. Azadî û firsenda xwe avakirinê ji jinan tê girtin; li beramberî vê xelateke derewîn a ‘exlaqî’ wek tac datînin ser serê wê; jina ku di zindîbûna xwe de layiqê quncikeke azad nayê dîtin, piştî mirina wê soza bihişta ku di bin lingê ‘dayika pîroz’ de tê raxistin, lê tê dayîn. Bi vî awayî jin bi îluzyona hatiye sazîkirin bawerî bi mirovbûna xwe ya pîroz tîne. Bi baweriya ‘serketina exlaqî’ xwe wek zayenda îdeal û mirova ji mêr baştir dibîne. Ev manîpulasyona tenik a pedagojiya zayendperest û hiyerarşîk li ser jinan wisa bi kêr tê ku, êdî jin bi dilxwazî ‘gorî û dîla’ mêr, zarok, civak û malbatê ne. Pedagojî bi vî awayî vedigere wateya xwe ya herî destpêkê: Xulama hevalrêtiya bi mêr re.

Jin çawa dikarin tevî taybetiyên xwe yên zayendî nasname û pedagojiyeke wekhev, ji cudahiyan re rêzgirtî û azad ava bikin? Jin dikarin bêyî ku bikevin xapik û xetereya ‘wekhevî’ya li ser bingeha desthilatdariya mêr hatiye sazîkirin û her wiha ‘xwe-çêtir-dîtin’a dîsa li gorî berjewendiya mêr hatiye şîrovekirin, pedagojiya zayenda azad ava bikin. Ev dê bibe mijara nivîsa bê.

# ‘Em tenê ji ber ku jin in ji mafên xwe bêpar dimînin’




Piştî ku Talîban li Afganistanê dest danî ser rêveberiyê, jiyana jinan di kêliyekê de hat guhertin.

Jinên afgan ku di rojekê de jiyana wan bi her awayî ji aliyê neyînî ve hat guhertin, serpêhatiyên xwe bi nivîsandina nameyan ji kesên navdar ên wek aktîvîstên xwediyên Xelata Nobelê Malala Yousafzaî, Îkona Modayê Halima Aden û Stêrka Futbolê ya Amerîkî Megan Rapinoe re parve kirin.

Ên ku ji mirovên navdar re nameyan dinivîsin jî di nav 100 jinên BBC’yê ku di sala 2021’ê de hatine hilbijartin cih digirin. Beşek ji wan jinan ji bo parastina xwe û malbatên xwe, ji ber hincetên ewlehiyê bi navên nepenî û bêwêne di lîsteyê de cih girtin.

**“Ez gelek xemgin dibim …”**

Xwendekar Rohila ku 17 salî ye, ji Malala Yousafzai re nivîsî û jê re got ku piştî ku Talîbanê qedexe kir ku xwendekarên keç xwendina xwe ya navîn nedomînin, xwendina wê qut bûye.

Nameya Rohila wiha ye:

“Bi rêz Malala,

Ez her sibe bi gotina ‘ez ji dibistanê dereng mam’ ji xewê radibim, lê paşê tê bîra min ku dibistana min girtiye û ez xemgîn dibim. Dema ku wesayîta çûnûhatinê birayên min digire û dibe, ez li paş dimînim.

Ez bi hêviya ku di dibistanên nêzîkî min vedibin û ez bibihîzim ku dikarim bi heval û mamosteyên xwe re hevdîtin bikim, li nûçeyan temaşe dikim. Ez gelek xemgîn im ku em tenê ji ber ku jin in, em ji mafê herî bingehîn ê perwerdehiyê bêpar dimînin…”

**‘Gava ku min li topê dinêrî...’**

Sahara ku li Afganistanê di tîma futbolê ya herêma xwe de dilîst, reviya welatekî din. Sahar ji stêrka futbolê ya amerîkî Megan Rapinoe re wiha fikarên xwe nivîsand.

"Birêz Megan,

…Futbol ji bo min ne tenê werzîşek e, dilxweşiyek e. Di van sê salên ku min lîstin, ez der barê taktîk û tevgeran de fêrî gelek tiştan bûm. Futbol malbata me, yanî heval û rahênerên min, tîmek mezin bû. Dema ku Talîban Kabûlê xist bin kontrola xwe, min dev ji lîstikê berda û ez pir xemgîn bûm. Dema min forma û pêlavên xwe yên futbolê û li topê temaşe dikir ez digiriyam.”

***Çavkanî: Nû Jinha***

# Yekane jin a ku li Rûbarokê mêşên hingivî xwedî dike

Hacer Es ku derçûyîya Rêveberiya Cemaweriyê ya Zanîngeha Heranê ye, li herêma Rûbarokê ya navçeya Şemzînanê ya Colemêrgê karê xwedîkirina mêşên hingivîn dike.

Hacer Es ku 7 sal in vî karî dike, çandiniya ku ji bavê xwe hîn bû, niha gihandiye asteke hîn pêşketî û nîşan dide ku jin dikarin her karî bikin.

Hacer Es diyar kir ku ew berhemên herêma Colemêrgê hildiberînin û wiha got: “Ji beşa Rêveberiya Cemaweriyê ya Zanîngeha Heranê derçûm. Bûye 7 sal ku karê xwedîkirina mêşên hingivîn dikim. Ji ber şewbê demekê ez li Kerkûkê xebitîm. Piştre vegeriyam û min karê xwedîkirina mêşên hingiv dewam kir. Her wiha qehweya kezwanan, tehîn û sabûna kezwanan bi xwe çêdikim. Min karê daneheva gwîz û pincar jî kir. Debara xwe bi vî karî dikim. Debara malbata xwe bi vî karî dikim. Bi sûdwergirtina ji bavê xwe, min biryar ji bo vî karê da."




Hacer Es da zanîn ku destpêkê nerazîbûneke neyînî ji derdorê li hemberî wê hatiye nişandan û ev tişt anî ziman: “Lê karekî gelekî bi kêf e. Ez niha bi karê xwe baş zanim. Jinek bixwaze dikare karê xwe bi rengê herî bedew û berhemdar bimeşîne. Dema ku jin bixwaze dikare karê herî zehmet jî bike. Li herêma Rûbarokê ya Şemzînanê yekane jina ku vî karî dike, ez im. Li cihekî zehmet vî karî dikim, lê kêfa min gelekî jê re tê, di nava xwezayê de me.” ***COLEMÊRG***

# Kujer serbest in, bêsûc girtî ne

Navenda Nûçeyan

**Li Tirkiyeyê girtiyên nexweş û kal girtî ne, lê çawişên pispor û polîs ên kujer li derve serbest digerin. Kujer Musa Orhan serbest e, lê mirovên nexweş ên wekî Mehmet Emîn Ozkan girtî ne**

Li Tirkiyeyê êdî her tişt berovajî bûye. Heqiyê û neheqiyê cih guhertiye. Rastî û şaşiyê cih guhertiye. Derew û rastiyan cih guhertiye. Edalet û bêedaletiyê cih guhertiye. Xerabî û qenciyê cih guhertiye. Hemû tiştên erênî bûne neyînî û hemû tiştên neyînî jî bûne erênî. Kesên herî zêde kedê didin xizan in. Kesên qet kedê nadin jî mirovên herî dewlemend in. Kesên doza mafên xwe yên azadiyê dikin, wekî kesên terorîst têne dîtin. Lê kesên tacîz, tecawizê dikin, mirovan dikujin û dewleta Tirkiyeyê dişelihînin jî wekî mirovên baş têne dîtin. Sedema vê yekê jî têkçûyîna pergala edalet û meclîsê ye. Têkçûyîna polîtîkaya Tirkiyeyê ye.



**Kujer serbest in, lê nexweş girtî ne**

Em vê rastiyê bi çend mînakan şênber bikin. Çawişê Pispor Mûsa Orhan ji ber tacîz, tecawiz û kuştina Îpek Er hat darizandin. Lê piştî demeke dirêj serbest hat darizandin. Musa Orhan herî dawî di 3'yê kanûnê de ji ber "êrîşa zayendî ya wesfdar" hat darizandin. Dadgehê 10 sal cezayê girtîgehê lê birî û ji ber "halê baş" daxwaza girtina Orhan red kir. Her çendî dadgehê 10 sal ceza lê birî be jî niha tecawizkar û Çawişê Pispor Musa Orhan serbest digere. Li gorî dozger û dadgeran kesên wekî Musa Orhan ê bû sedema kuştina Îpek Er û Yakûp Şahîn ê ciwanê zanîngehê Kemal Kurkut qetil kir, ji bo ewlehiya civakê talûke ne. Ji ber vê yekê hemû çawişên pispor û polîs ên tev li sûcê kuştinê bûne serbest digerin.

**Çima girtiyê 83 salî bernadin?**

Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî ku 26 sal in girtiye û bi îdîaya kuştina Fermandarê Herêmê yê Cendermeyan ê Navçeya Licê ya Amedê Tûgeneral Bahtiyar Aydin tê sûcdarkirin, tevî nexweşî û temenê xwe yê mezin nayê berdan. Niha jî bi vîrûsa koronayê ket. Girtiyê nexweşê giran Ozkan, tevî hemû serlêdanan jî nayê berdan. Rayedarên dadgehê bi hinceta "Ji bo ewlehiya civakê talûke ye" girtiyên nexweş ên wekî Mehmet Emîn Ozkan, Siddik Guler û Abdulhalîm Kirtay di girtîgehê de dihêle. Mehmet Emîn Ozkan 83 salî ye û 26 sal in girtî ye. Gelek nexweşiyên wî hene û niha bi şewba vîrûsa coronayê ketiye. Abdulhalîm Kirtay, 73 salî ye. 30 sal in girtiye û girtiyê nexweş e. Siddik Guler 81 saliye. 26 sal in girtiye. Wekî wan 604 girtiyên nexweş ên rewşa wan giran nayên berdan. Her çendî malbat serlêdana rayedaran dikin û li Baroya Amedê Nobeda Edaletê digirin jî dîsa girtiyên nexweş bi hinceta "ji bo civakê talûke ne" nayên berdan.

Lê nakokiya edaletê ya balkêş çawişê pispor Musa Orhan li gel 10 sal ceza lê tê birîn serbest e, lê Mehmet Emîn Ozkan ê 83 salî ku 26 sal in girtî ye, hêj nayê berdan.



## Gezer çawa jiyana xwe ji dest da?

Girtiya siyasî Garîbe Gezer a li Girtîgeha hejmara 1'ê ya Tîpa F a Kandirayê girtîbû bi îşkenceyek sîstematîk û destdirêjiyê re rûbirû ma. Di 9'ê kanûnê de bi awayekî bi guman jiyana xwe ji dest da. Gezer, bi awayekî bi guman li hucreya lê dihat girtin jiyana xwe ji dest da. Jinan cenazeyê Garîbe Gezer ji Nexweşxaneya Dewletê ya Kocaeliyê wergirtin. Dayikên Aştiyê, aktîvîstên Tevgera Jinên Azad (TJA), rêveberên Komeleya Malbatên Girtiyan û rêveberên HDP'ê û gelek rêxistinên jinan çûn ber nexweşxaneyê û ji morgê wergirtin. Jinan dirûşmeya "şehîd namirin" berz kirin. Cenaze li navçeya Kerboranê ya Mêrdînê spartin axê. ***MÊRDÎN***

# Qedexeya li tax û gundan berdewam kir




Komeleya Mafê Mirovan (ÎHD) û Weqfa Mafê Mirovan a Tirkiyê (TÎHV), bi minasebeta 10-17 Kanûnê Hefteya Mafê Mirovan rapora bi sernavê "Li Tirkiyeyê binpêkirina mafên mirovan a 2021'ê" aşkere kir. ÎHD û TÎHV'ê rapor li Navenda Giştî ya ÎHD'ê aşkere kir. Hevserokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan û Rêveberê TÎHV'ê Nîhat Bulut beşdarî daxuyaniyê bûn. Hevserokê Giştî yê ÎHD'ê Ozturk Turkdogan destnîşan kir ku di sala 2021'ê de gelek binpêkirinên mafan qewimîne û got: "Di serî de li Girtîgeha Îmraliyê û li gelek girtîgehan tecrîd û zext hene û mafên girtiyan tên binpêkirin. Di 11 mehan de 9 kes bi îdiaya li hişyariya polîsan û leşkeran a "raweste" guhdar nekirine hatine kuştin. Li girtîgehan ji ber nexweşî, xwekuştin, tundî û hincetên cuda 22 kesan jiyana xwe ji dest daye. Di 11 mehên sala 2021'ê de herî kêm 290 jin hatine kuştin.

**Hezar û 853 karker bûn qûrbana kar**

Turkdogan, bi bîr xist ku li gorî daneyên ÎSÎG'ê di 10 mehên 2021'ê de herî kêm Hezar û 853 karker di cînayetên kar de jiyana xwe ji dest dane. Turkdogan, bal kişand ser şerê Tirkiyeyê yê li derveyî sînor û wiha berdewam kir: "Tirkiyeyê di 2021'ê de li dijî Sûriye, Lîbya û Herêma Federe ya Kurdistanê operasyonên dersînor pêk anîne. Di van operasyonan de li herêma başûrê Kurdistanê bi giştî 231 kesan jiyana xwe ji dest dane."

Di raporê re hat diyar kirin ku 915 kes ji ber îşkence li wan hatiye kirin serî li Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) dane. Di raporê de ev agahî hatin parvekirin: "915 kesan ji ber îşkence li wan hatiye kirin serî li TÎHV'ê da ne. Li gorî tespîtên ÎHD'ê 415 kes di bin çavan de bi îşkenceyê re rû bi rû ma ne. Di çalakî, binçav û bi giştî 3 hezar û 671 mirov bi îşkence û muameleya xerab re rû bi rû ma ne.

**17 kes hatin revandin**

Li gorî tespîta navenda dokumantasyonê ya TÎHV'ê di 11 mehên 2021'ê de bi giştî 17 kes hatine revandin. Li gorî daneyên yekîneya dokumantasyonê ya ÎHD'ê jî heta 10'ê hezîrana 2020'î de 604 jê giran bi giştî 605 girtî nexweş in. Li Tirkiyeyê 59 rojnameger girtî ne. Di 2021'ê de 45 rojnameger hatin binçavkirin. Di 10 mehên 2021'ê de der barê 243 xebatkarên çapemeniyê de 116 doz hatin vekirin. Li Tirkiyeyê bi giştî der barê 26 hezar û 225 kesan de lêpirsîn hatiye vekirin.

**Xwestin 4 partiyên siyasî bigirin**

Ji ber astengî û qedexeyan 291 çalakî, daxuyanî û xwepêşandan hatine astengkirin. Der barê 4 partiyên siyasî de doza girtinê hatiye vekirin û ev doz didomin. Di qada siyasî de bi hinceta der barê parlamenterekê de biryara dadgehê hatiye erêkirin, wekîltiya wê hat betalkirin. Der barê 9 wekîlan de lêpirsîn hat vekirin.

**Qedexeya kolanan berdewam kir**

Di navbera 1'ê çileya 2021'ê heta 18'ê mijdara 2021'ê de li 32 taxên Bedlîsê 3 caran bi giştî 21 rojan qedexeya derketina kolanan hat îlankirin. Li 103 gundan 3 caran bi giştî 9 rojan qedexeya derketina kolanan hat îlankirin. Di heman dîrokê de li 66 taxên Mêrdînê 9 caran bi giştî 10 rojan qedexe hatin îlankirin. Li gorî tespîta Meclisa Tenduristiya Karkeran herî kêm 57 zarok bûne qurbana kar. Dîsa ji ber mafê penaberan nehatiye parastin, di 2021'ê de 71 penaberan jiyana xwe ji dest dane.

**Di 11 mehan de 49 sivîl qetil kirin**

Di hefteya mafên mirovan de her roj mafên mirovan tê binpêkirin. Li Efrînê bi taybetî piştî di 18'ê adara 2018'an de hêzên çekdar bajar dagir kirin, her roj mirov tên revandin û kuştin. Lê Neteweyên Yekbûyî û dewletên cîhanê li dijî van sûcên li dijî mirovahiyê bêdeng in. Li Efrînê, çeteyên DAÎŞ'ê û El Nûsrayê her roj mirovan direvînin û qetil dikin. Ji 20'ê çileya 2018'an û heta niha di êrîşan de herî kêm 686 sivîlên Efrînî hatin qetilkirin. Herî kêm 96 jin ji aliyê dagirkeran ve hatin qetilkirin. 7 ji wan ji ber êşkence û êrîşa zayendî dawî li jiyana xwe anîn. Komên çeteyan destdirêjî 71 jinan kirin. Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan a Efrînê, herî kêm 88 sivîl bi destê komên çeteyan ve bi êşkenceyê hatin qetilkirin.

Li Efrînê di sala 2021'ê de jî bûyerên revandina mirovan, êşkence, standina fîdye, qetilkirin û destavêtin bi awayekî sîstematîk dewam kir. Komên çeteyan yên girêdayî Tirkiyeyê di sala 2021'ê de 13 jê jin, 13 jê zarok bi giştî 49 sivîl qetil kirin. ***ENQERE***



# Berxwedana malbatan berfireh dibe

Navenda Nûçeyan

Têkoşîna Nobeda Edaletê ya Malbata Şenyaşar (Emîne Şenyaşar û lawê wê Ferît) a li dijî kuştina 3 ferdên malbata xwe di 9'ê adarê de dane destpêkirin 280 roj in didome. Di 14'ê hezîrana 2018'an de li navçeya Pirsûsê xizmên parlamenterê AKP'ê êrîşî malbata Şenyaşar kiribûn û ji malbatê 3 kes kuştibûn. Malbata Şenyaşar her roj li ber Edliyeya Rihayê Nobeda Edaletê digire. Her roj nûnerên partiyên siyasî, komele, sendîka, rêxistinên civakî û parazvanên mafên mirovan, nivîskar, akademîsyen û hunermerd serdana malbata Şenyaşar dikin û piştevaniya xwe tînin ziman.

Malbata Şenyaşar bi biryar e ku heta edalet pêk bê, dê çalakiya xwe berdewam bike. Malbat dixwaze kujer bên girtin û cezakirin.

**Li Sêmalka 70 roj in têdikoşin**

Çalakiya li Deriyê Sêmalka ya ji bo wergirtina cenazayên endamên HGP'ê yên li Xelîfan di kemîna PDK'ê de jiyana xwe ji dest dan ji bo wergirin 70 roj li pey xwe hişt. Her roj rêxistin û saziyek diçin serdana kon û çalakiya nobedê dewir digirin. Her roj kesên diçin serdanê bi coşek mezin û bi dirûşmeyan têne pêşwazîkirin. Girse di nobeda kon de dirûşmeyên piştgiriyê didin berxwedanê û dirûşmeyên îxanetê şermezar dikin, berz dikin. Nûner û rêveberên rêxistinên civakî û sivîl di serdanê de bang li hêzên navdewletî û hikûmeta Başûr dikin ku cenazeyan radestî malbatan bikin û êdî dawî li bikaranîna çekên kîmyewî bînin.

**Çalakiya malbatan mezin dibe**

Malbatên girtiyan, bi daxwaza ku girtiyên nexweş û girtiyên înfazên wan hatine şewitandin bên berdan di 16'ê mijdarê de li Baroya Amedê dest bi Nobeda Edaletê kirin û 28 rojin Nobeda Edaletê didome. Ji roja destpêka nobedê ve gelek partiyên siyasî, saziyên sivîl ên civakî, rêxistinên mafên mirovan, hiqûqnas û welatiyan serdana malbatan kirin. Her rojê saziyek diçe malbatan ziyaret dike û Nobeda Edaletê didome.

**Çalakî li bajaran belav dibin**

Malbatên girtiyan li Wanê jî bi heman armancê di 9'ê kanûnê de dest bi "Nobeda Edaletê" kirin. Li Eywana Konferansê ya Tahîr Elçî ya Baroya Wanê malbatên girtiyên nexweş Îbrahim Alkan, Emrah Abi û Sinan Karel ji bo nobedê bang li hemû malbatên girtiyan kirin. Nobeda Edaletê ya li Wanê di roja 5'an de didome.

PÊWISTIYA HERÊMÊ BI PERGALEKE EDALETÊ HEBÛ

# Ev pergal li gorî rengê civakê ye

Rizoyê Xerzî

*Ji bo zanebûnên der barê pergala darizandinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, me pirsên xwe ji hevseroka Yekitiya Parêzerên Cizîrê, parêzer Xedîca Ibtrahîm kirin. Ibrahîm di bersivên xwe de behsa çawaniya darizandinê, cudahiya vê pergalê ji pergalên din ên Sûriye û welatên derdorê û behsa pîvanên darizandinê yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê kir.*

**Tu dikarî ji kerema xwe hinekî behsa pergala darazê ya li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bikî? Kengî û çawa hate damezrandin?**

Pergala edaleta civakî li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jixwe pêşî li Rojava dest pê kir. Piştî şoreşa 19'ê tîrmeha 2012'an hat avakirin. Wê demê valahiyek çêbûbû, rejîma Sûriyeyê ji herêmên kurdan hate derxistin. Ji bo ji pirsgirêkên civakê re çareseriyeke bê dîtin komîteyên silhê hatin avakirin û sîstema edaleta civakî bi vî awayî hat damezirandin. Pirsgirêkên civakê gelekî zêdebûn û hewcebû ku di zûtirîn demê de bên çareserkirin lewma pêwistî bi sîstemeke wiha çêbû. Mînak dema dozek diçe pêş vê pergala edaletê, ev doz ne li gorî qanûnên dewletê li gorî rengê civakê tên çareserkirin. Em dikarin bibêjin ku li rojavayê Kurdistanê sîstema edaletê wiha hat avakirin.

**Çi cudahiya vê pergalê ji ya berê ango ya di dema rejîmê de heye?**

Bêguman di navbera sîstema edaleta civakî û sîstema dewletê de cudahiyeke mezin heye. Dozên ku tên du beş in. Yek dozên cezayî ne, ya din jî dozên medenî ne. Di nav dozên medenî de pirsgirêkên malbatî, mijarên pere yan jî li ser erdê hene. Ev dozên medenî pêşî di lijneya silhê re derbas dibe. Mînak ku di navbera du kesan de li ser erebeyekê pirsgirêk çêbûbe dê pêşî ew biçin Yekitiya Nivîsgehên Otombîlan. Ango yên karên danûstandina erebeyan dikin. Ji ber vê ew baştir dikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Heke pirsgirêkek ji ber xaniyekî derbikeve wê demê dê biçin ber Yekitiya Nivîsgehan. Heke pirsgirêk li wir çareser nebe wê demê dozê dibin mehkemeyê. Ev cudahiyeke pir mezin e. Li vir tiştа esasî ne qanûn in edalet e. Hedefa pêşî di navbera kesên ku pirsgirêk dijîn de avakirina silhê ye. Silh tê hedefkirin ji bo ku di nav civakê de acizî pêş nekeve. Li aliyê din hemû dîwanên ku di nav civakê de cih digirin ji aliyê dadgerekî/ê ve nayên bi rêvebirin. Li her dîwaneke sê dadger cih digirin. Ji ber ku keseke tenê nikare edaletê tesîs bike, ji ber vê di her dîwanê de sê kes cih digirin û hewceye di her dîwanekê de jin jî hebe.

**Tirkiyeyê pîvanên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê (DMME) qebûl kiriye. Divê Tirkiye li gorî pîvanên darizandina DMME'ê tev bigere. Pergala daraza Rojava, pergala DMME'yê çawa dibîne. Girêdana pergala daraza Rojava û DMME'yê bi hevre heye yan na?**

Rast e, Tirkiye pîvanên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê qebûl kiriye lê di hemû biyarên xwe de li dijî van pîvanan tevdigere. Mînaka vê ya herî berbiçav jî tecrîda li ser birêz Ocalan e. Tevî ku Ocalan 23'ê sal in girtî ye beriya demekê jî diyarkirin ku 6 meh cezayê dîsiplînê lê birîne. Tirkiye tu pîvanên ku qebûl kiriye pêk nayine. Jixwe di hevpeymana Rojava de xalek heye û wiha hatiye nivîsîn: 'Em hemû xalên hevpeyman, qanûnên navdewletî, mafên mirovan qebûl dikin û pêk tînin'. Qanûneke li Rojava derbikeve û qanûneke mafên mirovan ên navneteweyî hebe, heke qanûna Rojava li dijî qanûna navneteweyî be wê demê herdu qanûn jî nayinê qebûlkirin. Di sîstema edaleta Rojava de ev xal hatiye nivîsandin. Sîstema edaleta Rojava hê ne xwediyê tecrubeyeke zêde ye. Lê hewldanên ku tên dayîn ji bo mafên mirovan in. Heta îmkan hebe di amadekirina qanûnan de ev xal li ber çavan tên girtin. Têkiliyên li ser qanûnan ên di navbera Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de ne fermî ne.

**Pîvanên daraza Rojava yên sûc çi ne. Daraz kesên sûcdar bêtir bi kîjan rêbazan ceza dike?**

Dema giliyek li ser kesekî/ê hebe û sûcek kiribe ev gilî li gel dozger tê qeytkirin. Dozger gilî dişîne Nivîsgeha Têkoşîna li Dijî Sucên Plankirî. Gumanbar li wir îfade dide û hewce be tê girtin. Piştî îfadeyên gumanbar, dosyayê dişînin gel dadger. Dadger îfadeyê hem gumanbar hem jî yê ku gilî kiriye digire. Gumanbar li wir bi parêzerê xwe re îfadeyê dide. Piştî dadger heke dosya neyê girtin wê demê dosyayê dişînin Dîwana Edaletê. Parêzer li wir amade ye. Hem kesê ku gilî kiriye hem jî kesê gumanbar li wir parastina xwe dikin. Biryara ku ji Dîwana Edaletê dertê di nav deh rojan de diçe Temyîzê. Li wir jî kes tên guhdarkirin. Li Temyîzê biryara dawî derdikeve.



Pirsgirêkên civakê gelekî zêdebûn û hewcebû ku di zûtirîn demê de bên çareserkirin lewma pêwistî bi sîstemeke wiha çêbû. Mînak dema dozek diçe pêş vê pergala edaletê, ev doz ne li gorî qanûnên dewletê li gorî rengê civakê tên çareserkirin

**Darizandina kesan di kîjan pêvajoyan re derbas dibe?**

Li Bakur û Rojhilatê Suriyeyê Qanûna Cezayan û Qanûna Pêkanîna Cezayan hene. Gelek xebat li ser van herdu qanûnan hatin kirin û halê van qanûnan yên dawî ev saleke tên pêkanîn. Lê qanûnên ku neyên guhertin jî nînin. Carna li ser pêkanîna qanûnan rexne tên kirin û li ser van rexneyan ji bo başkirina qanûnan xebat tên meşandin. Tu kes li Rojava nabêje wa ye qanûn hatin nivîsîn û nayên guhertin. Di vê mijarê de qanûnên me nerm in. Ev nêzîkatiya nerm di hemû saziyên Rêveberiya Xweser de esas tê girtin. Bi taybet jî di qanûnên edaletê de.

**Li Tirkiyeyê hezar û 896 zarok girtîne. Li Rojava Pergala darazê çawa li sûcê zarokan dinêre?**

Li gorî qanûnên Rojava kesên temenê wan di bin 18 salana de be, weke zarok tên pênasekirin. Ev zarok jî di nav xwe de dibin du beş. Di beşa ku temenê wan di biniya 15 salî de be, dema ku sucekî bikin jixwe nayên girtin. Mînak zarokek çû cama erebeya yekî şikand wê demê ji malbata zarok zirara xwediyê erebê tê standin. Heke zarokên temenê wan di ser 15 salî re be, wê demê qanûnên ku ji bo wan hatine amadekirin lê tê birîn. Cezayê ji bo wan hatiye amadekirin wek yê mezinan nîne. Zarokê ku ji ber sûcekî bê girtin ne ku ji bo were cezakirin tê girtin. Ew zarok li Navenda Hûrî tê perwerde kirin ku bikaribe li civakê vegere.

**Kesên tewanbar piştî binçavkirinê di pêvajoyeke çawa re derbas dibin?**

Kesên tên girtin hewceye ku di nav 24 saetan de îfadeyê wan bê girtin. Ne raste ku kesek ji bo îfadeyê bê sekinandin. Piştî ku dadger biryara xwe girt û dosyayê şand Dîwana Edaletê hewceye ku di nav 24 saetan de dosya wî li wir jî bê dîtin.

Di binçavkirinê de mafê hevdîtina parêzeran ji bo gumanbar nayê astengkirin. Kesê ku cezayê girtîgehê lê hatibe birîn di girtîgehê de dikare malbata xwe bibîne.

Heke sûcdar cezayê ku hatiye birîn zêde bibîne dikare giliyên xwe li Meclisa Edaletê bike.

**Gelek endam û malbatên DAIŞ'ê li ba we girtî ne, pêvajoyeke çawa ji bo darizandina wan heye?**

Li Rojava gelek endamên DAIŞ'ê li kampa Holê tên girtin. Ev ji bo me zehmetiyeke mezin e.


Em mecbur in ku xwarin û pêwistiyên wan bi cih bînin. Ew malbatên ku li wir in di nav hev de dijîn û zarokên xwe jî li gorî hişmendiya DAIŞ'ê mezin dikin. Wek tê zanîn Hêzên Sûriyeya Demokratîk(HSD) li hemberî DAIŞ'ê şereke pir dijwar kir.

HSD'ê tenê ji bo parastina Bakur û Rojhilatê Suriyeyê şer kir, ji bo hemû cîhanê şer kir. Ji ber vê yekê pêwistbû ku hemû sazî û dezgehên mafên mirovan ên navneteweyî piştgirî bidana Rojava.

Divê her kes ji bo darizandina wan DAIŞ'iyan alîkarî bikira. Lê mixabin di qada navneteweyî de bêdengî heye.

DAIŞ'î jî di nav xwe de dibin du beş. Di beşekê de DAIŞ'iyên biyanî hene li aliyê din jî DAIŞ'iyên ji Reqa, Dêrazor û Minbîçê ne. Ji bo kesên biyanî derfetên Rojava tune ne ku dadgeheke pispor ji bo wan ava bike. Heke ew derfet bê dîtin jî piştî biryarê ew kesên biyanî dê li ku bimînin ew jî ne diyar e. Lê ji bo kesên sûriyeyî dê di demeke kin de darizandin destpê bike.

## Xedica Ibrahîm kî ye?



Parêzer Xedica Ibrahîm di sala 1966'an li gundê Dugirê yê girêdayî Tirbespiyê, hatiye dinyayê. Di sala 1986'an de xwendina xwe ya akademiya mamosteyan li bajarê Hesekê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi dawî kiriye. Di sala 2007'an de xwendina xwe ya beşa hiqûqê li zanîngeha Helebê xwendiye û li wir bi dawî kiriye. Xedica Ibrahîm niha jî li Rojavayê Kurdistanê hevseroka Yekitiya Parêzerên herêma Cizîrê ye.

# “Fast-think” an Muhendîsiya zimanî



Îbrahîm Seydo Aydogan

Peyva “fast-thinkers” ji aliyê Pierre Bourdieu ve hatiye bikaranîn. Ji bo ***“fikirdarên ku hema zû bi zû û beyî kûrahiyê ve li ser tiştan dipeyivin”*** tê bikaranîn. Yanî hayê wan baş ji meseleyê nîne, lê dikarin bi saetan behsa babetên rewşenbîrî û zanistî bikin ; teorî û hîpotezên ecêb yên dûrî aqilan lê li ser hin çavdêriyên berbiçav peyda dikin, pişta xwe dispêrin wan teoriyên ku cîhê nîqaşê ne û axir fikir û ramanine weha pêşkêş dikin ku, ji ber nebûna qadeke zanistî, dikare weke rastî û agahiyên ilmî û zanistî werin pejirandin.

Bourdieu bêtir behsa rewşenbîrên ser televizyonan dikir. Yê me, em ê li vira behsa wan pisporên bazara populer û populîst nekin, em ê behsa qada zimannasiyê bikin.

Di bernameyên televizyonan û di nîqaşên ser tora civakî de, em gellek caran li teorî û nîqaşên weha rast tên ku li ser zimanê kurdî nirxandinên ecêb derdixin holê. Ji xwe, ew her du war jî, mîna ku Bourdieu digot, cîhê agahiyên lezgîn in ku dikarin zû belav bibin.

Warê ku herî zêde nîqaşên belaş û bêkok li ser tên kirin, etîmolojî û rêziman û cudahiyên devokan e.

Perwerdehiya kurdî û zimannasiya kurdî, mixabin li parçeyê mezin yê Kurdistanê bi tenê di van çend salên dawîn de dest pê kiriye û hê ewqasî nû ye ku dijwar e ku mirov behsa berhemdariyeke wê ya gelemperî bike. Li Başûr û Rojava, digel ku azadtir bi pêş ve dikeve jî hê dûrî kûrahiya zanînê ye. Di rewşa nebûna pisporên weha de ku qada zanistî bi pêş ve bixin, li her çar parçeyan jî hingê çanda zimannasiya zanistî kêm dimîne.

Zimannasî warekî û ilmekî cuda ye, metod û pîvanên wê yên xweser hene ku cîhana zanistî li ser li hev kiriye; lê di nava civata me de gellek kes hene ku bi van karan radibin beyî ku guh bidin pîvan û metodên zanistî. Wê rojê yekî digot “yakın” (nêzîk) a tirkî ji peyva “ya kin” (ya ne dirêj) a kurdî hatiye û gelek kesan jî ew ji ber vê nirxandina wî pîroz dikir. Yekî din jî digot “bouillir” (kelîn) a fransî ji “bûyin” a kurdî hatiye, ji ber ku dengê wan dişibe hevdu ; lewre « bouillir » weke « bûyîr » tê xwendin. Asta hin gotar û pirtûkên zimannasiya kurdî jî, ne dûrî ya van teoriyan e. Eynî mîna peyva “avril” û “april” (nîsan) ku gellek kes bawer dikin ku bi eslê xwe ve peyveke kurdî ye û ji “av li rê” bûye “avrêl” û ketiye zimanên ewropî jî ; an jî “adar” ku “*av diçe daran*” e û hwd., ku di pirtûka û gotaran de jî çap bûne. Hin salnameyên kurdî jî peyva « avrêl » bi kar aniye. Mirov nikare bi aqlê zanistî ve nîqaşa van fikrên beradayî bike.

Di etîmolojiyê de, pîvan ne şibîna navbera peyvan e ; peyv dikarin bişibine hevdu, lê ya girîng wate ye ; lê mixabin ev prensîba bingehîn ne di bala wan kesan de ye. Ji me re pirtûkên etîmolojiyê yên ecêb û rêziman û rêberên rastnivîsînê yên ecêbtir ava dikin ku em ê bi dû re behsa wan jî bikin. Mirov li mala xwe nabe zimannas, lê mirov bê dîploma dibe mutahît.

Di dîroka hemû zimanan de muhendîsên wan hebûne. Bi taybetî di qirna navîn de li Ewropayê zimannasên xwedan van celeb teoriyan hebûn. Lê di sedsala 18’an û bi taybetî jî di sedsala 19’an de bingehê zimannasiya zanistî hate xurtkirin û bi taybetî jî di nîvê sedsala 20’an de zimannasiyeke pêşketî û xurt peyda bû ku îroj perwerdehiya wê li her derê tê dayin.

Di nava her civatê de “fast-thinkers” hene. Yên Kurdên bindest zêdetir in, ji ber ku perwerdehiya ilmî ya zimannasiyê nebûye para herkesî. Lê ya girîng ew e ku di qada nebûna pisporên zanist de, herkes dikare xwe weke pispor îlan bike. Peyveke fransî ya pêşiyan heye ku dibêje « ***li welatê koran, yên ku çavê wan hema piçekî bibîne jî dikin qral*** ». Civakên rojhilatî an civakên bindest ji bo van tiştan gellekî guncaw in.

Xebateke zimannasiyê ya ciddî ku bi destê Laurence Rosier (2004) ve hatiye kirin balê dikişîne ser vê çakaliya xeternak ya dûrî zanistiyê. Rosier dibêje ku zimannasiyeke gelêrî ya lezgîn ava dibe ku dûrî qad û pîvanên zanistî ye û bi taybetî jî di malper û forumên ser înternetê de xuya dibin. Tora civakî jî weha ye. Em carnan dibînin ku yek radibe û wêneyê kevçiyekî belav dike û dibêje “navê vê çi ye”. Hin kes peyda dibin ku dikarin ji kevçiyan re dibêjin “beroş” jî. Rosier ji van celeb karan re dibêje “***linguistique des profanes***”, yanî “***zimannasiya nezanan***”. Ji ber ku weşanxaneyên kurd jî bêyî ku li ser bifikirin hema rêzimanan çap dikin, pirsgirêka me ciddîtir dibe. Pirraniya rêzimanên me hevdu dubare dikin, ji ber hevdu digirin beyî ku tiştekî li hevdu zêde bikin.


Kovara ***Langages*** ya zimannasiya fransî, hejmareke taybet ya 154’an çap kiriye ku li ser van babetên “métalinguistique” e. Kovara “Le français d’aujourd’hui” (Fransiya îroj) jî, di hejmara 151’ê de bi taybetî behsa vê babeta “muhendîsiya zimanan” û “teoriyên lezgîn” an “bêkok” dike. Bi taybetî jî gotara Marie-Anne Paveau heye ku pişta xwe dispêre çavdêriya Rosier ya ku dibêje ku “***li ser înternetê bi pirranî tê dîtin***” û “***zanîneke ne tam rast û bi lezgînî***” tê belavkirin.

Sala 2008’an jî dîsa bi rêveberiya Paveau û Achard-Bayle, kovara ***Pratique*** hejmareke taybet li ser vê mijarê belav kiribû û teorîzekirina vî warê zimannasiyê gîhandibû qadeke zelaltir. Ew jî behsa “Folk Epistemologie” ya Heintz (2008) û kovara ***European Review of Philosophy*** dikin.

Li cîhana anglo-sakson, her ji salên 1960’î ve bingehê van nîqaşên li ser agahiyên nava gel hatiye danîn. Axir, Preston (2003) peyva “nezimannas” bi kar anî û got ku qada ***zimannasiya gelêrî*** dûrî pîvan û aqlê ilmî ye û lewma divê weke warekî ji derveyî zanistiyê were hesibandin.

We dît ? Di nava civatên din de jî pisporan nîqaşa van mijaran kiriye û pirsgirêk çareser kirine.

Di vê qada derveyî zanistiyê de, agahiya ku hatiye danîn dikare zû belav bibe, lewre nîqaş li ser nabe. Ya etîmolojiyê hê xerabtir e. Peyvinan tînin, dabeşkirinên morfolojîk yên ecêb dikin da ku teoriyên xwe piştrast bikin. Divê zimannas bi ciddiyet li ser bisekinin. Bi fransî ji van celeb teoriyan re dibêjin “teoriyên bi du qirûşan” an jî “felsefeya qahweyan”. Ya me jî bila “zimannasiya qahweyan” be an jî « zimannasiya belaş”.



Ji Delav

Feratê Dengizî

## Tenêtî azadî ye

Niha ji Şikefta Mehmo her der xuyayê û ez bi tenê me.

Tik û tenê

Bi tena serê xwe…

Her der xuyaye; Qiyamê Mehmîşeko, Zînî, Zînê biçûk, Şewla, li vî aliyî gund, Warkê Ereban, Devê Gur, Gêra Aşan, Nezarê Kemo..

Ez bi tenê me; tenêtî xweş e jî nexweşe jî..

Xweş e; bi serê xwe difikirim, bê gengeşî, bê miqerese û qayîş!

Belkî em kurd hînî vê rewşê bibin.

Paşê parvekirin.

Li ser jiyan, hebûn û mirinê yan jî tunebûnê difikirim.

Bi qasî ku aqlê min têrê bike. Nizanim ew ê têrê bike, neke. Bila be, her çiqasî kes aqlê bindestan neecibîne jî.

Belê me digot çi; hebûn… Jiyan. Bera em ji bonî çi hene yan jî jiyan çiye! Bila mirin niha li aliyekî bisekine. Li gorî ol yanî dîn-mîtolojiyan em tev ben-î Adem yanî zarokên Adem in û jê zêdebûne. Adem jî li gorî Îslamê ji bonî xatirê Muhammed(A.S) û Alem tev ji bonî xatirê wî afiriye. Xwedê-Teala em dane xatirê wî, amîn. Em dibêjin em pê bawer in, lê emelê me, pratîka me ne wisa ye. Em mirov pê nayên ser ji bonî ku em bihuşta baqî tapo bikin her cure fen û fûtan dikin. Kuro-keçê li ser baweriya xwe be û xwe bispêre hezkirina wan na li ser navên wan, ji bona xatirê berjewendiyên xwe, hem hezar sûcên xwe, kujeriya xwe dîsa dispêrên wan, lewra ew jî li me tên xezebê, ka yên ku fêhmbikin! Li gorî Xaçperest, yanî Xirîstiyanan Îsa lawê Xwedê ye, baş e, ma mirov xwe dispêrin hezkirina Îsa, gelo! Ku xwe bispartibûna, çima her hefte dikevin gunehan û roja yekşemê berê xwe didin dêrê “***de bavo Keşe va ez li xwe mikurtêm, min efû bikin! Bibin alîkar bila Rebê Alemê min efû bike, bi navênkariya Îsa***” îja ev çi ye! Ma ku baweriya we temam e, îca çima hûn dikevin bin gunehan û yelah doza efûkirinê….Wele aqlê min hilnayine. Yeke din jî dibêje ji bonî gunehên Adem û Hewa (bihevşabûn çima gunehe nizanim. Ma sêv be, genim be ne qodên hevşabûnê ne) em mirov tev gunehkar tên dinyayê… Ya, ma ev wisa dibe! Ma ev li meziniya Rebê Alemê tê, çima sûcê du kesan ku ew jî sûc e, ne sûc e, ne zelal e, dikeve stûyê tevahiya mirovên reben ên bi milyaran… Rebena tên dinyayê ku bi hebûnê şa bibin, tehmekê ji jiyanê bistînin, malavayiyê bikin ji afirdarê xwe, ji xwedayê xwe re, îca çima guneh!.. Bila şaş neyê fêhmkirin, ez bawermend im û ji her baweriyê re jî rêzdarim. Lê va şik û guman dikeve dilê min û bersiv jî min têr nakin! Loma dîn im. Biborin! Bêaqil im! Tew rewşa Cihûyan… Xwe bijarteyên mirovan dibînin, di ser her kesî re! Ma bijarteyî li rewşa Rebê Alemê tê! Ma ne em tev mirov in, qûlên wî… Îca çima newekhevî, çima ew bilind ên din nizm. Na, tişta ku hatiye serê wan ez jî li hemberim, napejirînim, êşa ku wan kişandiye wijdanê min dişewitîne û dilê min bi kizînî, kî dikare tişta ku Hîtlerê faşist aniye serê wan biecibîne! Lê rewşa baweriya wan û tişta ku tînin serê filistîniyan jî ne wijdana mirovan û mirovahiyê ye wek ku her ol û kes û milet tişta ku tînin serê me kurd û êzdiyan. Tu bawermend deng dernaxin û ew qasî jî rehet in. Ma ev e mirovahî û bawermendî… Wî îca ez ji gotina xwe dûrketim… Wek ku dizanim, belkî jî şaş im; cihû salê carekê gunehên xwe tevan li lênûskekê dinivîsin û li pişta bizinekê girêdidin û wê bera çolê didin… Ev bizin li çola tev kûm ku ji germa dişewite, wek germa dojehê… Bizina reben li ciyekî dimre yan jî dibe pariyê devê dirindeyekî wek şêr an jî keftarekî û qaşo gunehên bawermendên cihû efû dibin. Herê lo.. em yekî bikin “**Bizina Gunehan**”, guh nedin xêr û şer û li kêfa xwe binerin! Ma wisa hêsan e, ma wisa dibe… nizanim. Xwedê aqlê min, wijdanê min bistrîne!

Belkî baweriyên cuda cuda bi awayekî din ê ne aqilane û mirovane jiyan, hebûn û mirinê şirove dikin, nizanim. Her kes li benda axreta xwe, li benda qiyameta xwe, barê gunehê wî/wê li piştê… Lê me jiyan li hev kiriye cehennem…. Ma hewceyî dojeha axretê ye!

**Ya Star..!**

Ku me rewş guhert û mir pê ve çi dimîne! Bifikirin, bi ya min xîçek mezin, hîç… valahî. Em ê vegerin rewşeke din, ez dixwazim bibim kulîlik, lewra kulîlik, hezkirin, sewda, evîn e. Evîneke bê berjewendî. Xweşikiyek bêhempa ya erzan û ji dil, ji dilê hebûnê, şa bûn-şad bûn, hebûna pîroz. Mirov, însan, de were û tim xweşik be, dev ji şer, qirêjî, guneh, kujerî û xerabiyê berde, bibe evîn, bibe kulîlik…

Canlidarî û rewşa însan a mirov, mirovî peyda nabe, li Alema ku em dizanin, canlidariya bi şikl û şêweya me nîne. Ka em vê çawa dinirxînin, hesab li ba we…

Ez Simoyê Dengizî, li serê Şikefta Mehmo bi tenê, tik û tenê me.



Ji min re dibêjin Simoyê Dîn, belkî wisa ye, lê bi ya min mirov tev dîn in. Biaqilî zor û barekî giran, lê dînî erzan û rihet e.

Dizanim ku heqîqeta hebûnê, ya jiyanê hezkirin yanî evîn û bi hev ewlehî, bi xwe bawerî û bi her kesî, bi hebûna xwezayê û gerdûnê bawerî, dilsozî ye. Heqîqet, rastî-rasteqînî evîna welat û yarê ya hêvî hebûna gul-gulîstan bi fîstanê gulgulî ye, bi dilgermî û xweşnêrîn-germiya kenê te ye Rûkenê, wek rojhilata kendalê bagokî ye. Û mirin jî heqîqeta jiyanê û rewşguherîn e. Tev li axê, yanî tevli hebûnê dibin em vediguherin rewşeke din a hebûnê, yanî mirin tune ye bi aliyekî, rihet bin, her û her veguherîne, liv, liva gerdûnê. Hebûnek xweş î şîrîn. Lê ka em mirov qedrê vê çiqas dizanin, nizanim… Wek mirov me rewşek awarte, canlidariyek pîroz wergirtiyê, Rebbê Alemê cudatiyek xweşik daye me, lê ka aqil… em qedrê wê nizanin bi ya min. Ma mirovî, canlidarî hikmetek, nîmeteke ji rêzê ye! Lê em diherimînin. Ji dêvla şabûnê, mirov-mirovî tev neyarên hev û jiyanê li hev dikin gor…

Ligel ku mirin, rewşguherîn ango nemirî heye, dev ji kujeriyê berdin. Ma ne mirin heye! Kujerî na; evîn, hezkirin jiyan e, berxwedana ji bonî hebûnê jiyan e. Bi hebûnê şa-şad bibin, bi hev şa bibin; bila qencî-başî hebe, xerabîşaşî tunebe, bi hev şa-şad bibin. Hezkirin, hezkirin, hezkirin…

A va ne bitenê me, parvekirin tenêtiyê radike belkî, civakîbûn û germiya jiyana bi hevre, tiştekî qedirnas yê tenetiyê ye.

Tirs bêheq, wêrekî stûna jiyanê û bingeha azadiyê ye.

Tenêtî xweş e lo… Tenêtî azadî ye!

# 'Ji ol û rêxistinkirina êzidiyan ditirsin'

Navenda Nûçeyan

**Hevserokê Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan (PADÊ) Emer Saleh der barê êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Şangalê axivî û diyar kir ku Tirkiye bi hevkarên xwe re êrîşan plan dike**

Di 7'ê kanûna 2021'ê de balafirên bêmirov ên dewleta tirk, di roja yekemîn a Rojiya Êzî de êrîşî wesayîta Hevserokê Desteya Rêveber a Şengalê Merwan Bedel Xwedêda kir. Di êrîşê de Merwan Bedel jiyana xwe ji dest da. Di 9'ê kanûnê de cenazeyê Merwan Bedel ji aliyê bi hezaran kesan ve bi merasîmeke leşkerî ya bi heybet, li Goristana Şehîd Dilgeş û Berxwedan spartin axê. Ji bo Merwan Bedel konê sersaxiyê hat danîn. Hemû saziyên Rêveberiya Xweser, oldar, eşîr û xelkê gundewarên Şengalê, kom bi kom serdana kon kirin.

Hevserokê Partiya Azadî û Demokratîk a Êzidiyan (PADÊ) Emer Saleh der barê êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Şangalê nirxand.

Saleh li ser armanc û sedema êrîşan rawestiya û wiha got: "Bi salan e dewleta tirk û hevkarên wê, van êrîşan plan dikin. Civaka me îro xwedî îrade ye. Îro însanên ku dikarin civaka xwe bi rê ve bibin û pêşengiya wê bikin, dijmin wan dikin hedef. Îro dewleta tirk û hevkarên wê PDK û dewleta Iraqê ev êrîş bi hev re plan kirin û siyasetmedarên me kirin hedef. Kesên dibin hedef bi fikrên xwe dikaribûn rê li pêşiya DAIŞ'ê û van êrîşan bigirin. Ev plan û êrîşên li dijî hevalên me, berdewama plana bi sedan salan a li dijî xelkê Şengalê ye. Beriya 2003'ê û heta niha jî ev plan û hedef li ser xelkê Şengalê didome. Ji bo xelkê êzidî ji war û axa wan dûr bixin van êrîşan dikin. Armanc dikin ku xelkê êzidî ji axa êzidxanê dûr bixin."

**'Berê em qehremanên xelkê bûn'**

Saleh anî ziman û îro xelkê êzidî bûye xwedî vînek azad û dikare li ber



xwe bide û wiha axivî: "Xelkê me îro bûye îrade û xwe perwerde dike. Însanên me berê nizanibûn perwerde, siyaset û hêz çiye, lê îro xwedî perwerde, siyaset û hêz in. Berê însanên me qehremanên xelkê bûn. Me bi hezaran şehîd di ber axa Iraqê de dan. Lê îro em ji bo axa xwe şer dikin. Ev êrîş bi destê dewleta Iraqê pêk tê. Eger agahiya wan tunebûya û destê wan di van êrîşan de nebûya, niha der barê şehadeta Mam Zekî, heval Seîd Hesen û bi sedan însanên din de lêkolîn kiribûn. Heta niha me tu lêkolînek û lêpirsînek bi hêz ji dewleta Iraqê nedît. Dîsa me tu lêkolînek ji herêma Kurdistanê jî nedît."

**'Hikûmeta Başûr hevkariyê dike'**

Saleh, bal kişand ser polîtîkayên PDK'ê û wiha lê zêde kir: Hikûmeta Herêma Kurdistanê hevkariya DAIŞ'ê kir. Çawa hevkariya DAIŞ'ê kir? Dema Şengal radestî DAIŞ'ê kir, tê wateya ku nexwest li dijî DAIŞ'ê şer bike. Naxwaze ev dîrok û ev însanên vir li vir bijîn. Naxwaze ev ol bimîne. Ev şerê taybet li dijî ola êzidiyan e. Êrîş û planên li dijî êzidiyan xelas nebûne. Rast e DAIŞ hat tunekirin. Lê dîsa fikra DAIŞ'ê didome. Ew mirovên hevkariya DAIŞ'ê dikin dîsa dijîn. Plana li ser ax û civaka êzidiyan didome. Her êrîşên li ser êzidiyan pêk tên, di rojên pîroz de çêdibin. Êrîşa li dijî Mam Zekî di roja pîroz de pêk hat. Dewleta Iraqê jî û dewleta tirk jî hevkarê van êrîşan e. Dewleta tirk DAIŞ'ê xwedî dike û hevkariya wê dike. Naxwazin êzidî careke din bibin xwedî îrade. Çima ev êrîş pêk tên? Ji ber ku êzidî bûne xwedî vîn. Dikarin xwe bi rê ve bibin. Ji ber vê yekê ferman berdewam e."


**'Dê êrîş encam negirin'**

Saleh, da zanîn her ku êrîş dikin qehreman jî zêde dibin û wiha berdewam kir: "Ew dijmin e. Mirov nikare ji dijmin hevî bike. Ew êrîş dike. Em jî mecbûr in li ber xwe bidin. Em ji bo ola xwe, hebûna xwe û dîroka xwe mecbûr in li ber xwe bidin."

Saleh li ser hedefgirtina pêşengên êzidî jî rawestiya û wiha domand: "Li dîrokê binerin, beriya Mam Zekî, Zerdeşt û Seîd Hesen, kesên vîna wan hebû dîsa kiribûn hedef. Qebûl nakin êzidî bibin xwedî îrade û xwe bi rê ve bibin. Qebûl nakin hebûna xwe biparêzin. Naxwazin êzidî tifaqa xwe çêbikin. Ji ber vê yekê êrîş dikin. Dixwazin êzidî wekî beriya 2003-2004'an koleyên wan bin. Lê êzidî xwedî îrade ne û dikarin xwe biparêzin. Êzidî dikarin fermandaran û mamosteyan ji xwe re bigihînin. Dikarin hêza xwe ava bikin. Îro roj bi roj îrade û hêza êzidiyan xurtir dibe. Em di wê baweriye de ne, bi şehîdbûna hevalên me nikarin bi serkevin. Em bi hezaran jî şehîd bikevin, em ê bi hezaran jî bikevin cihê wan. "

Emer Saleh li ser tirsa êrîşkaran jî rawestiya û wiha got: "Şengal ji her alî de xwedî qîmet e. Ji ber vê yekê dewleta tirk, PDK, Iraq û DAIŞ ji çar alî ve êrîş dikin. Dewletên li dora me tev xêra êzidiyan naxwazin. Çima? Ji ber em li ser dinekî paqij in. Dînekî ku destûrê dide her însanî. Dema ev dîn û rêxistin bi serkeve, ewê carek din nikaribin êzidiyan tune bikin. Îro ew êzidiyên belav bûne carek din vedigerin ser axa xwe ya pîroz. Îro êzidî natirsin. Ev rêveberî îro di aliyê siyasî, navneteweyî û leşkerî de xwe xurtir dikin. Ji ber vê yekê dijmin naxwaze bibe xwedî vîn. Îro êzidî tola xwe hildidin. Ew ditirsin ku êzidî bi hêz bibin ev hesab ji wan bê pirsîn. Ji ber vê yekê naxwazin êzidî bi pêş ve biçin."

Saleh, herî dawî da zanîn ku Tirkiye ne bi hevkariya PDK'ê be nikare van êrîşan pêk bîne û wiha bi dawî kir: "Îro PDK'ê piştgirî nedabûya Tirkiyeyê, Tirkiyeyê nikaribû li herêmê bi cih bibûya. PDK hêzê dide dewleta tirk. Îro bi hinceta PKK'ê êrîşî Şengalê dikin. Heke casûsê wan li nava Şengalê tunebûya Heval Merwan Bedel nedibû hedef. Divê em tucar destûrê nedin casûsan. Divê em bêtir bibin yek, hêza xwe ya leşkerî, rêveberî û vîna siyasî xurt bikin."





Xweşkanî

Felemez Ulug

## Êrîşên DAIŞ'ê û palpiştên wê

Di van demê dawî de li Iraq û başûrê Kurdistanê li ser hev êrîşên DAIŞ'ê çêbûn. Ev êrîş bi giranî li dijî noqteyên pêşmergeyan çêbûn. Li ser van êrîşan ne hikûmata herêma Kurdistanê û ne jî hikûmeta navendî ya Bexdayê daxuyaniyên fermî nedan.

Gelek kes van êrîşan bi hilbijartinên 10'ê cotmehê yên parlamentoya Iraqê ve girêdidin. Lê rastî ne wisa ye. Ger di bingeha van êrîşan de nerazîbûnên li dijî hilbijartinê hebûya wê ji aliyên peywendîdar daxuyaniyek ango nerazîbûnek hatibûya nîşandin. Lê heta niha jî van aliyan deng derneketiye.

Wê demê divê em vê pirsê bikin. Zêdebûna van êrîşan tê çi wateyê? Bêguman li gor kesan bersiva vê pirsê jî tê guhertin. Lê di rastiya xwe de bersiveke vê pirsê heye ew jî guhertina rojevê ye.

Ji gelek aliyan, bi belgeyan hevkariya PDK'ê û dewleta tirk ya bi DAIŞ'ê re hatiye eşkere kirin. Dîsa di gelek belgeyan de hatiye gotin ku serçeteyên DAIŞ'ê li Hewler û Tirkiyeyê bi cih bûne. Ev komên çeteyan ên ku li hember şervanên azadiyê têkçûyîneke dîrokî jiyîne, êdî di destê van aliyan de ye û li gorî berjewendiyên wan tevdigerin.

Ev alî jî bi êrîşên tolhildanê yên bi DAIŞ'ê hewl didin dilê çeteyan xweş bikin. Ev êrîş li dijî kê pêk tên? Li dijî şervanên ku darbeya herî giran li çeteyên DAIŞ'ê xist pêk tên. Êrîşên dewleta tirk ên bi balafirên bêmirov û bi çek yên li Rojava, Mexmûr û Şengalê bi vê konseptê ve girêdayî ne.

Çeteyên DAIŞ'ê di demek pir kurt de gelek dever dagir kirin û qadeke pir berfireh xistin bin kontrola xwe. Di pêkanîna vê de bi deh hezaran sivîl qetil kirin û bi sed hezaran kes jî ji warên xwe hatin koçberkirin. Li hemberî vê hovîtiya DAIŞ'ê dewletên ku ji xwe re digotin "hêza super" jî neçar mabûn. Teknîka ku di her kêliyê de pesnê wê dihat dayîn jî bêbandor û vala hatibû derxistin. Di demekê de ku êdî her kesî pirsa; "Gelo wê DAIŞ çawa bê sekinandin" dikir, şervanên azadiyê derketin holê. Di serî de li Kobanê bi berxwedanek destanwarî DAIŞ'ê têk birin. Piştî serkeftina Şengalê, Mexmûr, Kerkûk û Reqa jî hatin rizgarkirin. Bi qasî serkeftina li Kobanê, azadkirina Şengalê jî di cîhanê de deng veda. Bi têkoşîna li dijî çeteyên DAIŞ'ê cara yekem keç û xortên civaka Êzidî ji bo parastina axa xwe çek hildan û ketin nav têkoşînê.

Bi hezaran ciwanên Êzidî di bin fermandariya Zekî Şengalî, Seîd Hesen, Zerdeşt Şengalî û Merwan Bedel Xwedêda li dijî dagirkerî, qetilkirin û talana DAIŞ'ê serî rakirin. Bi têkçûyîna çeteyan, ev cara ewilbû ku civaka Êzidî li ser nirxên demokratîk pergala xwerêvebirinê avakir û xwe bi xwe rêve bir.

Lê çeteyên DAIŞ'ê û hevkarên wê yên li herêmê têk çûn, bi awayekî nemerdane li dijî pêşengên vê şoreşê êrîş pêk anîn. Zekî Şengalî, Seîd Hesen, Zerdeşt Şengalî û Merwan Bedel Xwedêda di encama îstixbarata ku PDK'ê da MÎT'a tirk bûn hedefa êrîşan. Ev êrîşên ku di bingeha wê de tolhildana DAIŞ'ê heye, di heman demê de li dijî azadiya gelekî tên kirin. Hedefgirtina pêşengên civaka Êzidî ne bûyereke ji rêzê ye, ku mirov weke êrîşeke biçûk û normal bibîne. Lê mixabin hêzên navneteweyî yên di her firsetê de spasiya xwe ji şervanên YBŞ û YJŞ'ê re dikin ku wan li dijî DAIŞ'ê serkeftineke mezin bi dest xistiye, li dijî van êrîşên dewleta tirk bêdeng dimînin.

Ev durûtiya hêzên navneteweyî siyaseta qirêj ya li ser civaka Kurd tê meşandin radixe ber çavan. Em ji bîr nekin ku 9'ê cotmeha 2020'î de di navbera PDK'ê, hikûmeta Bexdayê û Dewleta tirk de li ser Şengalê peymanek hatibû îmzekirin. Ev peymana ku di bin çavdêriya Nûnera Taybet a Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî a li Iraqê Jeanine Hennis Plasschaert hatibû îmzekirin berfirehiya planên li ser Şengalê tên kirin eşkere dikir. Gelê Şengalê bi hemû pêkhateyên xwe ve li dijî vê peymana bêyom serî hildan û dan diyarkirin ku wê bi tu awayî vê peymanê qebûl nekin.

Li ser vê helwesta xelkê Şengalê êrîşên li ser herêmê jî zêdetir bûn. Li dijî van êrîşên bi destê dewleta tirk a dagirker de pêş dikevin him hikûmeta navendî ya Bexdayê him jî ya herêma Kurdistanê bêdeng ma. Sedama bêdengiya wan jî hevkariya wan ya di van êrîşan de ye.

Hikûmeta Iraqê têkildarî êrîşa Şengalê daxuyaniyek da û Tirkiye şermezar kir. Bexdadê hewl da bi vê daxuyaniyê xwe ji bûyerê bişo. Hemû kes baş dizanin ku ger Bexda destûr nede dewleta tirk nikare êrîşeke bi vî rengî pêk bîne. Lewma ger Bexda di vê helwesta xwe de ji dil be, divê ji şermezarkirinê zêdetir gavên pratîk bavêje û qada hewayî ji balafirên dewleta tirk re bigire. Nexwe baweriya kesî ji van gotinên xemilandî û ne ji dil re nayê.

Dewleta tirk bi vê êrîşê hewl dide ku rojevê biguherîne. Guhertina rojevê ne tenê ji bo dewleta tirk ji bo hevkarên wê yê li herêmê jî girîng e. Di demeke wisa de herkes behsa gendeliyên Mesrûr Berzanî û krîza aborî ya li Tirkiyeyê dike, di qada navneteweyî de daxwaza azadiya Rêber Apo zêde dibe û rakirina qedexeya li ser PKK tê nîqaş kirin, êrîşeke bi vî rengî ne tesadufe.

Lewma em dikarin bibêjin aliyên bi DAIŞ'ê re di nav hevkariyê dene hem ji bo xwe hem jî ji bo hevkarên xwe li pêy tolê ne. Êrîşên li Şengal û Rojava li dijî pêşengê civakê pêşdikevin di çarçoveya tolhildana çeteyên DAIŞ'ê de pêş dikevin. Bi van êrîşan ve girîdayî DAIŞ jî li herêmê li gorî berjewendêyên van aliyan êrîşan pêk tîne. Êrîşên li ser pêşmergeyan pêşdikevin mirov dikare di vê çarçoveyê de bigre dest.

# Xizaniya Başûr dewlemendiya Barzanî

Navenda Nûçeyan

**Rojnamegerê amerîkî Zack Kopplin li ser mal û milkê veşarî yê malabata Barzanî lêkolîn kir. Kopplin diyar kir ku tenê mal û milkê ku me dîtî hêjayî 75 milyon dolarî ye**




Di rojên dawî de li başûrê Kurdistanê xwendekarên zanîngehan ji ber hikûmet mûçeyê wan nadin, çalakiyên girseyî li dar xistin. Bi hezaran xwendekar daketin kolanan. Rojnamegerê amerîkî Zack Kopplin, li ser mal û milkê malbata Barzanî lêkolîn kir. Di encama lêkolînê de Kopplîn, mal û milkê veşarî yê malbata Barzanî bi belgeyan derxist holê.

Rojnameger Kopplin di gotara xwe ya bi navê 'Cowboy Drugstore' (Dermanxaneya Kovboy) de ku di rojnameya The American Prospect'ê de Xanûmanên li Kaliforniya û Virginiayayê jî di nav de bigiştî buhayê 75 milyon dolar 4 mal û milkên veşarî yên li DYA derxist holê. Rojnameger Kopplin anî ziman ku ev mal û milkê malbata Barzanî yê li DYA'ê hatiye dîtin, tenê pareke biçûk e.Têkildarî mijarê Medya News'ê bi rojnameger Zack Kopplîn re axivî. Kopplin diyar kir ku malbata Barzanî li Dewleta Yekbûyî ya Amarîkayê (DYA) 4 şirketên mezin ava kirine.

**Barzanî û şîrîkên wan**

Kopplin li ser nelirêtiya li Iraqê 4 sal in dixebite. Nêzî 6 meh in li ser gotara 'Dermanxaneya Kovboyê' lêkolînê dike. Rojnameger Kopplîn, ewil peymanên di navbera şirketa leşkerî ya taybet a Amerikayê û şirketên Serokwezîrê Iraqê yê berê Nûrî el Malikî derxistin holê. Li ser vê têkiliyê xwe dighîne peymanên di navbera şirketên leşkerî yên Amarika û malbata Barzaniyan.

**Dermanxaneya li Miamiyê**

Kopplîn piştî xwe gîhand belge û qeydên şirketa ku navê Mesrur Barzanî li ser heye teyît kir ku ev şirket li perava turîstîk a Miamiyê hatiye avakirin û xwediyê Dermanxaneya Amarîkayê ye. Buhayê dermanxaneya navborî hêjayî 18,3 milyon dolarî ye.

**'Pere ji mûçeyan qut dikin'**

Rojnameger Zack Kopplîn anî ziman ku li DYA'yê 4 milkên cuda yên malbata Barzanî hene û wiha got: "Li Kaliforniya, Beverly Hillsê 2 heb qesir (xanûman) hene. Li Virginia xanûmanek heye. Niha li Miamiyê der barê CVS (Dermanxanê) de agahiyên me hene. Ev mal û milkên malbata Barzanî tenê yên em dizanin. Tenê mal û milkê ku me dît hêjayî 75 milyon dolarî ye. Wekî din li Dubaî û cihên din ji qat bi qat ji vî malî zêdetir mal heye. Di qeydên '983 Washington Manager' de navê Masrur Barzanî heye. Ev jî nêzî 50 milyar dolar serwet e. 150 sal berê ew qas milyar dolarên malbata Barzanî tune bû. Piştî bûn desthila ev pere ji mûçeyên mirovan qut kirin û kom kirin. Niha pêşmerge nikarin mûçeyên xwe bistînin. Xwendekar nikarin mûçeyên xwe bistînin. Ji mirovan re dibêjin 'Perê hikûmetê tune ye' lê kesên hikûmetê bi rêve dibin ew qas mal û milkê wan li derve heye. Ev çawa çê dibe?"

Di belgeya şirketa 983 Washington SB'yê de navê Muksî M. Barzanî xuya dike.

Kopplîn têkildarî înkara Serokwezîr Mesrur Barzanî ya di vê mijarê de jî wiha got: "Dema min nûçe çêdikir, min xwest xwe bigînim wan. Lê bersîv nedan min. Her kes dikare van çavkanî û belgeyan lêkolîn bike. Çiqas bixwaze jî nikare înkar bike."

# Çima Şengal?

Serdem Silo

Bi giştî di serdem û dîroka civaka êzidî de û heta niha kurdên êzidî li hemberî komkujî û kuştina kesayetan rû bi rû mane. Piştî êrîşên dewleta tirk li ser nexweşxaneya Sekîniyê di 17'ê tebaxê de komkujiyek pêk hat û di encamê de 8 welatiyan jiyana xwe ji dest dan. Dîsa berî çend rojan bi êrîşeke hovane Hevserokê Meclîsa Rêveberiya Xweser ya Demokratîk a Şengalê Merwan Bedel û zarokên wî hatin qetil kirin.

Dema em rewşa Iraqê ji başûr heta bakur di ber çavan re derbas bikin, em dibînin tê de gelek hêzên herêmî û navnetewî bernameyên xwe henin. Her yek ji wan dixwazin bi riya piştgiriya bi komên çekdar re berjewendiyên xwe bi cih bînin. Her wiha piştgirî û alîkariya DAIŞ'ê û komên radîqal jî dikin. Bi vî awayî dixwazin bernameyên xwe yên stratejîk li Iraqê pêk bînin. Di encamê de dixwazin serweriya xwe li ser Iraqê ferz bikin.

Îran û Tirkiye jî li herêmên Iraqê xwedî hêzên nerewa ne û herdu jî armanca serweriya xwe li Iraqê ferz dikin. Di pêşbirkê de ne û bi taybetî li navçeyên bi nakok ên girêdayî madeya 140 a destûra Iraqê ku Şengal jî di nava van navçeyan de ye. Ji ber ku ji bo hemû hêzan Şengalê li devereke stratejîk in, ji bo serweriya xwe li wir jî ferz bikin hemû hêz di pêşbirkê de ne. Nemaze ji ber ku Şengal, Sûriye û Iraqê bi hev ve girê dide girîng e.

Îran û Tirkiye li Iraqê xwedî bernameyeke taybet in. Îran piştgiriya hêz û aliyê Şîayan dike da ku kevaneke Şîayî ava bike û eniya xwe ya hundurîn bi rêya Iraqê biparêze. Tirkiye jî dixwaze li rex tirkmenan aliyên sûnî bi ser xwe ve bîne da ku karibe serweriya xwe li herêmên Kerkûk, Mûsil, Şengal û Tileiferê ferz bike. Her du alî jî dixwazin hilberîna petrola Iraqê bi dest xwe ve bînin û serweriya dergehên sînorî bikin. Armanca van her du dewletan jî aboriya xwe ku aloziyên giran dijîn, geş bikin. Li aliyekî din ev her du dewlet di siyaseta Iraqê de xwedî gotinên bibandor in.

Pêşbirkiya Tirkiye û Îranê li Iraqê nîşaneya têkçûyîna Iraqê ya di demên pêş de ye. Her wiha ev nîşaneya derketina aloziyeke demdirêj ya li Iraqê ye. ji ber ku gelek dosye hene û nehatine çareserkirin. Dibe ku li Iraqê şerekî navxweyî rû bide û bi hêsanî ev şer neyê vemirandin.

Dema em fermana dawî ya li dijî kurdên êzidî ya tebaxa 2014'an tînin bîra xwe eşkere ye ku hovîtiyên herî giran li dijî civaka êzidî pêk hatin. Lê vê carê ji bo êzidiyan dem guheriye û dema êzidiyan rûreşiya hemûyan eşkere kir, dest bi xebatên xwebirêxistinê kir û di demeke lez de hêzên xwe yên parastinê Yekîneyên Berxwedana Şengalê (YBŞ) û Yekîneyên Jinên Şengalê (YJŞ) û rêveberiya xwe ya xweser ava kirin.

Ji bo rêveberiya xweser li Şengalê were hilweşandin di 9'ê cotmeha 2020'î de komployek li dijî Şengalê hat meşandin. Her çiqas were gotin ev komplo bi navê hevpeyaman 9'ê cotmehê di navbera hikûmeta Kazimî û Partî Demokartî Kurdistan (PDK) de hat meşandin jî di vê komloyê de her wiha gelek dewletên weke Tirkiyeyê beşdar bûn. Lê bi saya berxwedana kurdên êzidî û dîplomasiya ku Rêveberiya Xweser a Şengalê ev komplo hat pûçkirin.

Piştî ku dewletên beşdarî komploya 9'ê cotmehê bûne civaka êzidî bi hêza xwe komplo pûç kir. Dewleta tirk êrîşên xwe yên ezmanî li dijî kesayetên êzidî zêde kirin. Dewleta tirk îsal Fermandarê YBŞ'ê Seîd Hesen û di van demên dawî de jî Hevserokê Meclîsa Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Şengalê Merwan Bedel qetil kirin. Dewleta tirk tunekirina civaka êzidî kiriye armanca xwe. ji ber vê yekê bi hemû hêz û derfetên xwe hewl dide Rêveberiya Xweser a Şengalê hilweşîne. Lê li aliyê din civaka êzidî êdî ji van siyasetan haydar e û li hemberî van komployan xwe bêtir birêxistin dike û li hemberî hemû metirsiyan li ber xwe dide.

# Welatparêzî

Aramê Elegezê

Li ser mijara welatparêziyê berê jî gelek şîrove, gotin û analîzên civakî pêk hatine, dibe ku ya me jî dubare be. Lê şîrove û nirxandinên der barê ramanên civakê de dem bi dem dubare çêdibin. Ev rêbazeke perwerdehiyê ye. Ji bo ku mirov armanca xwe bide fahmkirin an jî ji bo di meseleyê de bibe pispor pêdivî bi dubarekirina vê rêbazê heye.

Divê bê zanîn em kurd, weke netewe van demên dawiyê dîsa di rojeva çapemeniya cîhanê da ne. Nêzîkî çar hezar kurd, ji bo ku biçin welatên Ewropayê berê xwe dane sînorên Belarûs û Poloniyayê. Li ser sînor rewşeke kambax, kirêt û serşorî derketibû holê. Erkedarên herdu welatan, her wiha saziyên ku bi navê mafên mirovan kar dikin, di erebeyan de, mîna ku nan bidin kûçikan, nan û kil û pel diavêtin nava wan. Di qadê de jî penaberan xwe hildavêtin jor, destên xwe li hewa digerandin, ji bo pariyek nan bigirin. Ew gelê nan afirandî niha li ber deriyê xelkê pêdiviya wan bi pariyek nan heye! Ax ku a!

Dema li seranserê çiyayên Kurdistanê ji meha adarê heya dawiya meha gulanê, pincar, kardî, kivark û hêşnahiyên cûrbecûr bên berevkirin, dê pêdiviyên xurek ên mirovan ji bo salekê bi hêsanî pêk bên. Eger çandiniya birinc, nok, fasûlî, ceh, genim û tiştên din li deşta Nînovayê (Duhok), Pişderê (Ranya), deşta Germiyan (ji Helepçeyê heya Kerkukê) li tê kirin, bê berhevkirin dê têra hemû Rojhilata Navîn bike. Di hemû gund, navçe û newalan de guz, tirî, xox, sêv, behîv, hirmê, gîlas, simaq û hema bibêjin hemû cûreyên fêkî hene. Mixabin nivşên nû vî karî nakin û berê xwe didin Ewropayê û di kolan û cihên destşoyên wan de kar dikin.

Di vir de dikare bê gotin ku pirsgirêkên ciwanan ên xwendina bilind, aboriyê, polîtîkayê, azadiya fikir û ramanê û bêkariyê hene. Ji xwe mijarên civakî pir in û li hev asê bûne. Erê rast e, ev hemû jî hene û bi piranî jî mirov bêzar dikin. Koçberî, welat wêrankirin, çare û dermanê vê yekê di geryana li ber deriyê xelkê de nîn e. Gotineke pêşiyan heye; Çavê li deriyan, xwelî seriyan!

Me berê ji bav û kal û dapîran bihîstibû; dema ferman di ser gelê me de hatibû digotin 'rewş wisa giran bûbû, dayikan zarokên xwe diavêtin!` Niha jî ji bo biçin welatekî xerîb, nediyar, ji bo pariyek nan dayik zarokên xwe li ser sînoran davêjin. Zarok, berî dema xwe tên cîhanê an jî jiber jinan diçin. Her wiha dê û bav ji bo xwe ji mirinê xilas bikin, zarokên xwe diavêjin. Rewşeke kambax e ku mirov nikare bîne zimên. A balkêş û mirov matmayî dihêle ew e ku di nava vê girseyê de kesên bi çapemaniyê re diaxivin, xwe weke kurdistaniyên welatparêz didin nasîn û dibejin, "em bi naçerî ji ber zilm û zordariyê direvin. Wisa diyar e hingî modernîzmê, îdeolojiya lîberalîzmê û mîlîgeriyê pîvanên welatparêziyê şîlo kirine, reva ji welêt bûye pîvana welatparêziyê. Gelo wateya peyva welatparêziyê nayê fahmkirin?

Wê demê em careke din wateya welatparêziyê dubare bikin: Welatparêzî hezkirin û parastina xaka niştiman, xwezaya xwe, gelê xwe û çanda xwe ye. Li gorî hemû pirtûkên olî jî welatparêzî erka serek ye. Kî ji bo gelê xwe û xaka niştiman bi ar û abor şer bike, bimire, ew pakrewan (şehîd) tê nasîn. Gelo ev welat ê bi navê Ewropa tê nasîn li ser siniya zêrîn çêbûye? Welatên Ewropa Belarûs û Rusyayê yan jî Poloniyayê tenê di şerê cîhanê yê duyem de nêzî 40 mîlyon cangorî dane.

Li vir divê mirov hinek tiştan ji nû ve bi wate bike: Ma ne em mirov in, em zindî ne, heyî ne. Ma gelo erka her zindiyekî jî ne xweparastin e? Parastin tenê çek û erka çekdarbûyînê nîne! Bi gotina pêşiyên me; kevir di cihê xwe de girane! Eger mirov li gorî vê gotinê tevbigere, axa xwe neterikandin erka welatparêziyê ye; li çanda xwe, ol û bawerîya xwe, bîrewariya welatê xwe, dîrok û zimanê xwe xwedîderketin jî erka welatparêziyê ye.

Berî her tiştî Ewropa berpirsayrê çarperçekirina Kurdistanê ye. Ên çekên kîmyewî dan Saddam û bûn sebebên komkujiya Helebçe welatên rojavayî bûn. Di serî de jî Almanya bû. Niha jî ên çekên kîmyewî didin Tirkiyayê û çiyayên welatê me, zarokên gelê me tune dikin dîsa welatên Ewropayê ne.

Di encamê de ev rêwîtiya malkambax ya ku planeke Tirkiyayê û hevalbendên wê ye ji bo ku bi rêya penaberan zextê li ser Ewropayê bike aşkera bû. Ev ne îdîa ye, ev rastî ye. Li vir ev pirs girîng e. Ma gelo bûyîna amûr di destê xelkê de welatparêzî ye?

Bêguman fêlbaziya polîtîkaya desthilatên cîhanî heye û dê hebe jî. Ev relîteya cîhana îroyîn e, yan jî xewfiroşên welêt bûne amûrên dagirkeran û gelê nezan dixapînin. Ji rê derdixin, berê wan dindin dervayî welêt û bi xwe jî welatê wan talan dikin. Lê em mirov in, hişê me jî heye, hişmendîya me jî heye, çawa dijmin nabe dost, xwefiroşî jî nabe welatparêzî. Wê demê em ê ji bo xwe li rêyên çareseriyê bigerin, çawa dijmin, xwefiroş bi hev re mil bi mil têdikoşin divê em welatparêz jî li dijî wan bibin yek. Gotina bav û kalan heye. Derd û kul û azar yek bin, dergeh jî hezar in! Ango erka welatparêziyê ya vê demê jî afirandina rêya çareseriyê ye, ne reva ji welêt e.



# Siwarê hespê xelkê her peya ye



Kadrî Esen



Aboriya Tirkiyeyê ji ber daxwaz û pêkanînên Erdogan, weke desthilata wî av û av diçe. Hin caran av û av çûyîn baş e. Ji bo kesên ku bi avê de diçin dibe paqijî. Lê ev ji bo AKP'ê û Erdogan qet ne baş e. Ji ber ku pergala ku ava kirine her derî dilewitîne. Lewre destê xwe diavêjin çi hê bêtir gemarî dibin û rengê xwe baştir didin der.

Ji bo ku ji vê rewşê rizgar bibin, ji xwe re papilûkek (Bahçelî-MHP) dîtine. Lê çi heyf! Ev papilûk ji cemedê ye, kêlî bi kêlî dihele û li gemara wan zêde dibe. Êdî kî rê li ber wan xistibe û ji wan re bûbe keştî bi vê gemariya xwe li qiraxa welatên kendavê qelibîn.

Desthilata AKP'ê ji bo xwe ji qrîza aborî xelas bike, berê xwe da welatên Kendavê. Di bin navê peymanan de dest bi parsekiya pereyan kir. Bi vê yekê dixwaze di pêşbirka li dijî muxalefetê de bi ser keve. Armanc ev e, lê dê encam bibe çi hîn nediyar e.

Piştî "dijminahiyeke" mezin Erdogan destê xwe li ber Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî vekir. Di vê çarçoveyê de Erdogan gotinên xwe yên beriya niha yên ji bo Pismîrê Welîext ê Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî Şêx Mûhammed bîn Zayed Al Nahyan daqurtand. Piştî vê daqurtanê Erdogan di 24'ê mijdarê de Şêx Mûhammed li qesra xwe bi merasîmeke fermî pêşwazî kir.

Heta roja ku ev serdan pêk hat jî Pismîrê Welîext xayîn bû û welatê wî Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî jî bi Amerîkayê re yek ji welatên piştgirê Hewldana Darbeya Leşkerî ya 15'ê Tîrmehê bû.

Bêguman têkiliya dîplomatîk pragmatîst e. Lê ev nayê wê wateyê ku her gotin û sûcdarî li dijî hev bên kirin. Heke ev bê kirin jî divê mirov ji heqê vê rewşê derkeve.

Lê ji ber ku AKP û Erdogan ev prensîb ji holê rakirine, pir bi hêsanî dikarin bibin mêvanên dijminan. Di vê çarçoveyê de Erdogan jî dixwaze li Pismîrê Welîext ê "xayîn" bibe mêvan û peymanên parsekiya xwe bi veşart berfirehtir bike.

Weke ku tê zanîn Erdogan ne tenê ji ber angaşta piştgiriya hewldana darbeya li dijî xwe, ji ber têkiliyên wan ên bi Îsraîlê re jî dijminahiya Mîrnişînên Erebî yên Yekbûyî dikir.

Lê derket holê ku ev dijminahî jî dijminahiyeke derewîn e û tu bingeheke wê tune ye.

Dema vegera xwe ya Qatarê Erdogan got ku wê têkiliyên xwe yên bi Îsraîlê re jî careke din binirxînin. Ji van peyaman diyar e ku wê Erdogan gotinên xwe yên li dijî Îsraîlê jî daqurtîne û bi rêveberiya nû ya Îsraîlê re dest bi pêvajoyeke nû bike.

Beriya niha Erdogan ji bo xweşkirina têkiliyên xwe yên bi Misrê û serokkomarê wê Abdulfettah es-Sîsî yê bi gotina wî"darbekar" re rêveberên Birayên Misliman ên xwe avêtibûn bextê wî firotibû.

Wisa xuyaye ku ji bo "xatirê" têkiliyên bi Îsraîlê re Erdogan dê doza Filistînê jî bifiroşe.

Erdogan van teqlan ji bo xelasbûyîna ji qrîza aborî davêje.

Gelo dizane ku bêyî avêtina van teqlan jî xelasbûyîna ji vê rewşê pêkan bû? Heke tenê terka şerê li dijî kurdan bikira û bi wan papilûkên ji cemedê nexapiya wê teqez ji vê rewşê xelas bibûya.

Lê mixabin dema ku mirov siwarê hespê xelkê be, her peya ye.

# Sendroma neşiyanî



Şindar Akinci

Di serî de ez ê dê hinekî li ser navê vê sendromê çend gotinan bibêjim. Di zimanê îngilîzî de navê vê sendromê "burnout syndrom" e. Burn; şewat, out; ji derve ye. Bi tirkî jî "tükenmişlik sendromu" ye. Min di ferhengekê de li wergera wê ya tirkî nêrî. Di wergera îngilîzî de jî weke "sendroma şewitandinê" hatiye binavkirin. Lê hema şewat ne li gorî mantiqê ye. Wisa difikirim ku mîna lîstikekê be,"tu şewitî derkeve!" Ew şewat jî bi xwe re nemabûyîn tîne û mirov vêca li ser jiyana rasteqîn bifikire... Ev têkilî tenê hat bîra min li ser navê wê yî îngilîzî. Lê li gorî min pênaseya sendromê ya bi tirkî baştir e.

Îca ez bêm ser mijara sernivîsa xwe. Navê vê sendromê pêşniyaza mamoste Sîdar Jîr û Zana Farqînî ye. Bila ev diyar be. Ji ber ku ew jî hêla ziman, wêje û gotinan ve têra xwe hene, min pêşniyaza wan kir sernivîsa nivîsa xwe. Mamoste Sîdar ji hevalekî xwe yên Xorasanî jî pirsîye, wî jî gotiye em jê vê sendromê re dibêjin 'fersûdige'. Ev pêyv tê wateya riziyayîbûyînê. Navê vê sendromê ji wergera îngilîzî nestandine, wan bixwe ev nav lê kirine. Li gorî min ev nav  gelekî lê hatiye. Zimanê me ji ber ku bi bişaftin û tundiyê re rû bi rû maye û hîn ne bi pergal e, di dibêjim navên hin tiştan jî ji ber vê yekê nediyar in. Ev sendrom di sala 1970'yan de ji aliyê Herbert Freudenbergerê psîkoterapîst ve derketiye holê. Freudenberger vê sendromê weke mînaka westiyayîbûn, zêde dijwarî, bêxwestekî( ji hêla hemû tiştî) û gilîyên ku mirov ji bo laşê xwe dike(weke êşê) pênase dike. Ev sendrom di serê ewil de ji bo karên civakî yan jî kesên ku di karên dikin de xwe zêde diêşînin/dixebitin re dihat gotin. Belê niha komên karmendan an jî bilî van mînakan, weke mirov li kesekî/ê ketî û ji malbatê ye binere (weke pîreke ketî) her wiha dayika ku karê malê û zaroka herî zêde li ser pişta wan e jî di bin xetereyê de ne. Ji wexta ku pênaseya vê nexweşiyê hatiye kirin û heta niha, gelek lêkolîn û ji bo teşhîskirina sendromê gelek test hatine kirin. Christina Maslach yek ji wan e ku ev test bi pêşxistiye û paşnavê xwe lê kiriye. Bi vî awayî sendrom hatiye tespît kirin. Pênaseya Maslachê jî li ser vê nexweşiyê ev e; bi kesên ku li gorî jiyana kar hêvîyên xwestekên hestî tê xwestin( lîstikvanî) û her car bi mirovan re rû bi rû mayîn van kesan bi awayek fizîkî diwestîne bê taqet û bê hêvî dihêle. Ev jî kesên ku bi vê nexweşiyê re rû bi rû dimînin, li hember derdorê yan jî karê xwe dike karê kesekî/e neyênî.

Sendroma neşiyanî ji hêla WHO(Rêxistina Tenduristîyê ya Cîhanê) ve di navnîşa Tesnîfkirina Nexweşiyên Navneteweyî de cih girtiye.

Bi taybetî di mirovên ku bi lez û bez ji barê xebatê ku bes bikaribe rabe tê dîtin û di kesên di bin streseke giran de ne, di encama ku ferd xwe mecbûr dike ku di van şert û mercan de bixebite, hilweşîn piştî qonaxek diyar dest pê dike û nexweşî bi xwe dest pê dike. Kesên bi vê nexweşiyê ketine dibin weke kesekî/e ku nasnameya xwe winda kiriye. Bandora wê ne tenê li derûnîyê, li laşê mirov jî dixe. Çimkî nexweş xwe bêhêz û bêenerjî hîs dike. Ji ber vê kesên bi vê sendromê ketine bes dikarin karekî bikin û carna jî nikarin ji nav nivînên xwe derkevin. Xwe li hember cîhanê weke tiştekî teknolojîk ku bê girtin digirin. Fikara "êdî ez bi kêrî tiştekî û kesekî nayêm" bi wan re çê dibe. Li hember pêşerojê bêhêvî dibin ji bo jiyana xwe nikarin ti planan bikin.

#### Nîşaneyên Sendroma Neşiyanî

Ji ber ku ev nexweşî hêdî û bi awayekî dizî bi pêş dikeve haya mirov ji vê nexweşiyê çênabe û pêdiviya serîlêdana saziyek tenduristiyê nabîne. Li tevahiya cîhanê xelk li hember şert û mercên jiyanê yên dijwar li ber xwe dide û van hestê xwe weke tiştek hêsan dibînin. Ev jî dibe dijwariyeke din ji bo ferqkirina vê nexweşiyê. Wexta nexweşî tedawî nebe û bi ser de stres û zordariya jiyanê hîn zêdetir bibe, tundîya nexweşîyê jî zêdetir dibe û semptom jî êdî derdikevin holê. Em dikarin nîşaneyên herî xuya bi vî awayî rêz bikin:

• Hesta westandina beden • Westandina hestyarî • Êsîrgirtina fikrên neyênî• Dudilîbûn • Di xebitandina karên hêsan de dijwarî• Ji kar dûr ketin• Bê hêvîbûn • Xwe bêqîmet hîskirin• Di kar de kêmbûna bi xwe nebawerî • Her car xwe bêtaqet û westiyayî hîskirin  • Ponijinî û jibîrkirin • Problemên xewê • Lêdana dil û zehmetkişana nefesê • Qebizbûyîn û zikçûyîn • Di serî, pişt û lingan de êş.

Ji bilî van semptomên, li gorî kesan jî bandorên cuda tên dîtin. Ji ber vê heke bi we re bandora vê nexweşiyê hebe teqez biçin testê bikin! Ne ez, pispor dibêjin. Bi piranî ev nexweşî di sê kategoriyan de tê nirxandin

#### Neşiyaniya Hestû

Ez dibêjim qey ev nav li vê faktorê nehat, lê heta tiştin di ziman de rûnin navê me dît ev e. Em dikarin bibêjin qelsbûna hestan, nemayîna hestan û hwd.(heke lê bê). Heke hûn xwedî neşiyaniya hestûbin hewce nake hûn xwedî karekî jî bin yanî ji ber ku dibêjin bi piranî  yê xwedî kar bêtir di bin xetereyê de ye. Pispor dibêjin heke hûn tenê sibehê zû biçin kar jî hûn dikarin xwe ji hêla hesta neşiyan/bêhest hîsbikin. Di rewşên hêsan de tişta ku hûnê bi kirina wê  baş hîsbikin(ger, betlane, bi hevalan re têkilî) wexta hûn bi neşiyaniya hestî bin wê bi we ne xweş bê. Weke hestên hêrsî, bêhêvîbûyîn û heta bi hinekan re somatîzasyon( ji bo ku nexweşek di vê pênaseyê  de cih bigire, divê were destnîşankirin ku di kar, malbat, dibistan an jî jiyana xwe ya civakî de bi  nexweşiyên cûr be cûr bandor bû ye.) jî çêdibe.



#### Depersonalization

Kesên xwe neşiyan hîsdikin bi xelkên der dora xwe re (nexweş, mişterî, heval û hwd.) di têkiliyên xwe de hestên wan kêm dibin. Ew bêwate dibînin ku dema xwe vala derbas bikin û têkiliyan biparêzin. Hêdî hêdî rûmeta xwe(bi hîs) têkiliyên hevaltiyê û kar kêm dibe. Fikrên neyênî û pê re ji ber vê xwe sûcdar dîtin dest pê dike. Xwe biyanî û guhertî hîsdikin.

#### Adaniya kêm û hesta bêkêmasiyê

Adanî kêm dibe. Ên neşiyaniyê hîs dikin xwe dibînin û dikevin metirsiya dudiliyê ya rakirina barê kar an jî karê rojane. Wexta dikevin vê tirsê bêtir dixebitin û dixwazin wê adaniyê bi derman, alkol, an bi dermanê hişçûyînê bilind bikin. Bandora vê nexweşiyê hem li gorî faktorên derholê hem jî li gorî kesan tê guhartin. Belê tişta herî xwerû jî ev e; tim bêhntengî, bi stresa kronîk keda dikşîne vê sendromê. Li kar jî tişta ku bandor dike jî ev e; kar di bin kîjan şertan de didome.

Şexs di pêşiyê de sînyala vê nexweşiyê digire. Sînyalên pêşiyê wek mînak; nikarin di xew re biçin û pê re sibeha zû şiyar nabin. Wekî din li gorî xalên wan ê qels bandor dike. Li hin kesan pirsgirêkên mîdê, li hin kesan êşa serî û piştê derdikeve. Mirov çawa dikare bibe bergirê vê sendromê.

Kesên ku di bin xetereya neşiyaniyê de ne li şûna ku barê xwe li hemberî îşaretên hişyariyê sivik bikin, hewl didin ku bi rewşên ku nayên bi rê ve birin re rû bi rû bimînin bi baldarî û kêmkirina dema ku ji xwe re vediqetînin. Ev dê pergaleke xelet be, heke mirov jê fahm bike ku tiştek xelet e, divê ew rawest e û guh bide xwe. Paşê piştgiriyekê ji pispor bigire, ji bo ku  stres bi ser nekeve. Ji ber ku sendroma neşiyaniyê bi nîşaneyên depresyonê re têkîldar in, dermankirina wê bi piranî dişibin dermankirina nexweşiyên depresyonê. Li gorî vê yekê, hem psîkoterapî û hem jî tedawîya narkotîkê dikare wekî rêbazên dermankirinê yên bandorker di tedawîya derveyî û hundirîn a sendroma neşiyanî de were dîtin

# Garîbe Gezer ameye kiştene

Valere



Roj çina ke zîndananê Tirkîya ra xebera teda, binpaylerdişê heqê merdiman, îşkence, tacîz, tecawuz û ûsn. nêra. Vera tepişteyê camêrdan de polîtîkayê cîya û vera cinîyan de zî polîtîkayê cîya cîyayî yenê rayraberdene. Nameyê îşkencekaro zilmkar ê bi name û veng ke dima ra ame cezakerdene Esat Oktayî hema zî goşê her merdimî de zimeno. Zîndanê Tirkîya de no merdim sey mînak yeno dîyayene. O wext zilmê Oktayî vera xeylê tepişteyî xelisnayîş grevê vêşanîye ê mergî, çalakîya adir verayîşê bedenan û çalakîyê fedaî de dîyî. Her çend ke şexs bibedelîyê zî zîhnîyeto zilmkar hema zî nê caardişan ra fek vera nêdayo û zilmê zilmkaran dewam keno.

Mexdura tewr peynî ya zîndanê Tirkîya Garîbe Gezere ya. Garîbe Gezera ke Zîndanê Kandira de tepişteya sîyasî bi 9ê kanûne de bi hawayêko şikin dinyaya xo bedilnaye. Gezere hucreyê yewkesî de mendêne û verê cû zî xeberan de ameybî weşanayene ke Gezere hetê îdarekaranê (gardîyan) zîndanî ra bi hawayêko sîstematîk raştê hêrîşê cinsî ameya. Xokiştişê Gezerî ra dima îdareyê zîndanî îdîa kerd ke Garîbe xo kişta û otopsîya vernî ya Garîbe bê avukatan ameya kerdene.

Ma tîya ra dest bi nuşteyê xo bikerî. Tîya de persê 'gelo Garîbe xo kişta ya ameya kiştiş?' yeno hişê merdimî. Çîyo raşt no yo ke wirdî zî yew î. Garîbe xo kiştiba zî bîla sebeb xo nêkişta. Tu gandarêk bîla sebeb xo nêkişeno. Çîyê ke Garîbe sewqê xokiştişî kerdî estî. Xora rojanê verênan de derheqê hêrîşê cinsî ê vera Garîbe de vejîyabî. Her çend ke bêro vatene ke Garîbe xo kişta zî çîyo ke cuyayî aye sewqê çîyêko winasî kerde.

Na rewşe adeta manena rewşa ke timî cinî raştê ci yenî. Zîndan beno, teber beno qet ferq nêkeno zîhnîyeto ke nizdîyê cinîyan beno yew o. Her roje cinî hetê camêrdo serdest ke hetê dewleta camêrd ra yeno pawitene ra yenê kiştene yan zî xokiştişî ver yenê antene. Dima ra xeberan de yeno vatene ke cinî xo kişta û bes. La çîyo ke cinîyan sewqê rewşêka winasî kerdo de nîno vindetene. Sankî cinî hema reyêk de aciz bîya û çîyêko winasî kerda. Xokiştişê cinîyan daxî sey çîyêko normal yeno nîşandayene. Kerdox nîno cezakerdene, ekse ci yeno pawitene. Sîstemê huqûqî têk şîyo. Cinî sey cinsek diyîne yena vînayene û muameleyê merdiman nêvînena. Heto bîn de cinî û camêrdo ke eksê dewlete fikirîyenê rê muameleye cinsê hirêne yeno kerdene. Yanî wexto ke merdim sey dewlete rayra nêşêro o wext 3 reye beno hedefê hêzê serdestan.

Mergê Garîbe de hewl dîyeno ke wina bêro kerdene. Yeno vatene ke Garîbe hucreyêko yewkesî de merde ameya vînayene. La ma pêro dî ke Garîbe raştê hêrîşê cinsî ê gardîyanan ameya. Gelo gardîyanêk ame tepitene? Nê. Derheqê gardîyanêk de zabitnameyêk daxî nêame tepiştene. Gelo kerdox kam o? Bi destê kamî ameyo kerdene? Cewabê nê persan qet ferq nêkeno. Çimkî kerdox eşkera yo. Hewteya Heqê merdiman de cuyayîşê hedîseyêko winasî merdim xemgîn keno. Hêzê serdest xokiştişê Garîbe û heme cinîyan de hîkayeyan nuseno. Cinî bi xo zî destanan nusena. Cuya her cinîyêk destanêk a. Cinî vera zîhnîyeto serdest de xover dana û layikê cuyêka azad a. Hewteya Heqê Merdiman de reyna ma dî ke heqê merdiman yeno binpaykerdene.

## Amed û Çewlîg de mergê şikin ê cinîyan

Tora Vera Şîddetî de Têkoşîn ê Amedî bale ant mergê şikin ê cinîyan ke demanê peyênan de Amed û Çewlîg de zêde virazîyenê. Tora Vera Şîddetî de Têkoşîn ê Amedî derheqê babete de eşkerayîyêka nuştekî weşanaye. Demêko dergo ke mergê cinîyan û xokiştişê cinîyan sey mergêko xozayî yeno pêşkeşkerdene û zêdîyayîşê hûmarêka cidî esta. Tora Vera Şîddetî de Têkoşîn ê Amedî derheqê babete de raporêk hadre kerd û vat ke hûmara mergê şikin ê ke pêroyê Tirkîya de virazîyenê û humara cînayetan seyyewbînan a. Sewbîna rapor de wina mae vatene: "Mergan de 'susê xokiştişî' yeno dayene û mergê şikinî 'antişê vere xokiştişî' yenê hesibnayene. Na hûmare her roje zêdîyena. Hawayêko cîddî û şikin nizdîyê hedîseyan nîno kerdene. Pawitişê heqê cuye, cezakerdiş û eşkerakerdişê sucdaran karê dewlete ê yewine yo. Ganî her mergê cinî û LGBTÎ+ yan de şikê cînayetî ser de bêro vindetene û kerdox bêro cezakerdene. Bajarê Amed û Çewlîgî de taybet rojanê peyênan de mergê şikin zêdîyayî. Rayîrê Amed û Swêregî ser de wesayîtêk ame vindertene û mîyanê ci de cinîyêka merde ame dîyayene. Camêrdo ke mîyanê wesayîtî de bî û mêrdeyê aye yê veren bî vat ke 'cinê xo kişta'. Netîceyê cigêrayîşanê ma de xebera; Berfîn Kilavuze xo nêkişta la xokiştişî ver ameya antene ameye ma rê. Çewlîg de zî mergê Şifanura ke Wargehê Wendekaran ê Cinîyan ê Pîr Alî yo ke girêdayeyeê KYKî bî sey xokiştişî ame nîşandayene. Ma hem terefê xo ra û hem zî terefê çapamenîye ra paweyê eşkerayîya selahîyetdaran î."

***AMED***

# Şarî rê qedexe yo la seydwanan rê serbest o



Pê bira Komîsyonê Seydwanîye yê Dêrsimî herêmê Kutudere, Dokuz Kayalar, Arpanos, Herêma Hîran, Gelîya Înî û Herêma Çemişgezekî zî tede 8 herêmî sey warê seydwanîye ameyî îlankerdene. Xeylêk seydwanî şaristananê cîya-cîyayan ra ameyî Dêrsim ke heywanan qir bikerê.

Tewr peyên 6ê teşrîna peyêne de 10 seyîdwanê îspanyolî ameyî Dêrsim. Komîsyonê Seydwanîye yê Merkezî pare kerd ke lîsteya seydwanîye de pezkovîyî çin ê la 24-29ê teşrîna peyêne de seydwanan Gelîya Înî ya Mazgêrdî de pezkovîyî kiştî. Aktîvîstê xoza Haydar Çetînkayayî derheqê têgêrayîşê seydwanan ê Dêrsimî de Ajansê Mezopotamya rê qisey kerd.

Çetînkayayî îfade kerd ke pê bira Komîsyonê Seydwanîye her serre şaristan de heywanî kişîyenê û vat: "Tay seydwanî zî bi hawayêkê qeçaxî Dêrsim de heywanan kişenê. Şaristan de yew mekanîzma çin a ke seydwanîye kontrol bikera. Nika seba kişîyayîşê 120 heywanan destûr dîyayo. Ganî şar vera ney nêrazîbîyayîşê xo bimojno. Seydwanî vanê 'Dewlete destûr dayo ma, belgeyê ma estê.' No zî şermê ma yo. Seydwanîye spor nîya cînayet a. Wa her kes naye bizano."

Çetînkayayî pare kerd ke hişmendîya AKP-MHPyî do qetî seydwanîye qedexe mekera û vat: "Ma pê madenan gêrîyayî binê ablûqa. Dêrsim hetê floraya xo ya heywan û nebatan ra zaf zengîn a. La yeno waştene ke na flora bêra çinkerdene. Eke xozaya ma bêra qirkerdene nê heywanî se benê? Eke verê ney nêro girewtene Dêrsim do bibo warê seydwanîye. Ganî ma vera ney nêrazîbîyayîşê xo bimojnê."

***DÊRSIM***

# 'Beno ke Pulur de çeka kîmyewîye şuxilîyaya'

Dewleta tirke qezaya Pulurî ya Dêrsimî de operasyono leşkerî dabi destpêkerdene. 5ê kanûne de bombardumanê artêşa tirke ya îşxalkere de 8 gerîlayê HPG û YJA Starî şehîd bibîy. Parlementerbê Partîya Demokratîke ya Şaran (HDP) yê Dêrsimî Alîcan Onluyî pare kerd ke beno ke nê operasyonî de çeka kîmyewîye ameya şuxilnayene.



Onluyî da zanayene ke 8 cenazayî wedarîyayî Dezgehê Tipê Edlî yê Meletî û vat: "Keyeyanê cenazayan vat ke cenazayan ser de rêçê guleyî çin o û cenazayî bîyê sîya. Keyeyan îdîa kerd ke çeka kîmyewîye şuxilîyaya. Keyeyan waşt ke na îdîa ser o muracat bikerê la selahîyetdaran înan rê gefê 'Eke şima îdîaya winasêne bîyarê ziwan ma cenazayan nêdanê' wendo. Keyeyan zî semedo ke cade cenazayanê xo bigêrê na îdîa nêarda ziwan."


Onluyî îfade kerd ke ganî na îdîa bêra cigêrayene û vat: "Ma zanenê ke dezgehî hê binê tesîrê Qesre de yê û ê do cigêrayîşî nêkerê. Sere de Neteweyê Yewbîyayeyî ganî dezgehê mîyanneteweyî têbigêrê û na îdîa cibigêrê. Sûco winasên ê şerî ganî bêro eşkerakerdene."

Onluyî bale ante ser ke cenazayê gerîlayan nêdîyenê keyeyan û cade yenê binerdkerdene û vat: "Vera keyeyanê gerîlayan zulm û sûcê merdimîye yeno kerdene. Cenazayî nêdîyenê keyeyan. Key keyeyî cenaza bigêrê zî destûr nêdîyeno ke ferdê keyeyan tewrê merasîmê definkerdişî bibê. Destûr nêdîyeno ke wecîbeyê dînî bêrê caardene. Cenazayî nêmeyê şewe yenê remnayene, seke erzîyenê qulikêk de yenê binerdkerdene. Nê zî sey şuxilîyayîşê çeka kîmyewîye sûcê merdimîye yê." ***DÊRSIM***






# Tiştanok (mamik)



Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Her wiha em dixwazin hûn tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.

**1-**Ezmanê darîne
Berfê dibarîne
Gelo ew çi ye?

**2-**Tiştek min heye
Mamê mino
Bilnd dibe ne ruh e
Bi baske ne çûk e
Kî dizane ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

**Bersivên me ev in:**

**1-** Bêjing, moxil **2-** Balafir

# Fitûyên meleyan

Mele dikarin mijaran wek nanê sêlê geh bi vî alî de geh bi wî alî de biqulbînin. Lê bi kîjan alî de bibin her ew alî li feydeya wan e. Gelek meseleyên meleyên sextekar hene ku şerîet û fitûyan li gorî berjewendiyên xwe diguherînin. Ev jî yek ji wan meseleyên melayan e ku çawa meseleyan li gorî xwe eyar dikin. Mêrik ji melayê gund re got: "Seyda, Kerê me kerê te kuşt."

Mele bi nermî got: "Tişt nabe, kerek bi kerekî ye."

Rabûn jê re gotin: "Na... na.. seyda te şaş fêm kir, kerê te kerekî me kuştiye."

Mele got: "Bêhna xwe fireh bikin, ma ez çi bikim? Jixwe ker ker e, tew nizane çi dike"

Gundî têgihîştin ku ew tew nikarin qirûşeke pere yan jî kerekî ji mele bistînin. Wî baş bergîriya kerê xwe kiriye.

***Cankurd Duderi***






Fatma Taşlî Tûnç

# Kundirê dimsê

Rojekê çend zilam ji deşta Mûşê bi rê dikevin û berê xwe didin beriya Mêrdînê Qoserê, diçin palehiya nîsk, ceh û genim.

Çend rojan dixebitin, rojekê yekî gundî bangî wan dike û dibêje:

- Hevalên hêja, sê rojan karê min heye, hûn ê nîskê min biçinin, lê dê nanê we ji kîsê we be. Mixabin hevjîna min nexweşe, nikare ji we re şîv û xwarinê çêbike.

Pale qebûl dikin û di nava xwe de diaxivin û li hev dikin. Ê ser pale dibêje:

- Hevalno, em ê rojê ji xwe re çend nanan bikirin, de hema em ê sê-çar rojan îdare bikin. Du roj derbas dibin, roja sisêyan dixebitin heta nîvro, li ser avê radiwestin, dest û serçavên xwe dişon.Tûrikê nanê xwe datînin ber xwe, kulma xwe di avê de dikin û di ser pariyê nanê tisî de vedixwin.

Serpale bi emirê xwe ji hevalên xwe mazintir e.

Bêtir di nava tecrûbeyên jiyanê de pijiyaye. Li hevalên xwe dizîvire û wiha ji wan re dibêje.

- Hevalno, Weleh em çend roj in ji nêza mirin. Xwedê poşmaniyê nede lê ez poşman bûm ku min ev kar qebûl kir!

Hîn gotina wî di devê wî debû, bala xwe didê ciwanek sêzdeh -çardeh salî ku şivanê kulekaye tîne ser avê. Dema digihîje nêzîkî wan silavê dide wan û dibêje.

-Xaloo ma hûn nanê tisî dixwin?

- Erê weleh xwarzê, xwediyê erdê nanê me kiriye ji kîsê me, em xerîbin, ne ji van dera ne, de way xwedê qedand!

-Xalo ez herim ji we re dimsê bînim.

Pale li çavê hev dinêrin û tev bi hev re dibêjin:

-Weleh ku tu bînî em ê bixwin.

-De bila çavê we li kulekên min be, ez ê aniha bînim.

Pale nanê xwe datînin û bi çar çavan li rêya xorto dinêrin.

Bala xwe didinê ku kundirekî bi boçik tije dims, di ber hemêza xorto deye û ber bi wan ve tê!

Pale bi hevre bazdidin pêşiya wî û çavên wî maç dikin, kêfxweşiya xwe nîşan wî didin, wekî ku ji xelayê derketibin, kundir didin destê hev, qurto qurto li hev parve dikin. Zikê xwe têr dikin û şukuriya xwe bi xwedê tînin, ava sar bi ser de vedixwin, yek ji wan li xorto dizîvire û dibêje:

-Xwarzê qey dimsa we geleke?

-Na Weleh Xalo, du kûpê me yê dimsê hebûn lê mişk ketibû vî kûpê me..!

-Te got çi?

-Min got mişk ketibû vî kûpê me.

-Niha ev dimsa ku me xwar mişk ketibû navê?

-Erê weleh!

Ji kerba çavê wan sor dibin, yek ji nav wan radibe ser xwe, bi boçika kundir digire û li nav guhê erdê dixe û kundir dibe pazdeh parçe.

Dema xorto çav li kundirê şikestî dikeve pişta xwe dide darê, digirî û dibêje:

-Ay li min bavooo!


Ez ê çawa herim malê ? Wê dapîra min, min bikuje! Ew kundir ê mîza wê bû! Ka ew ê êdî mîza Xwe di çi de bike?

Pale tev matmayî dimînin, di cihê xwe de disekinin û li çavên hev dinêrin.

Xorto jî bi çavê şil, kulekên xwe dide pêşiya xwe, rêya malê digre û dimeşe.

Carna di nav giriyê xwe de jî ji wan re xeberan dide.

# XAÇEPIRS



**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Feqîr, perîşan 3. Êdî 5. Heta bi hetayê
6. Mektûb 7. Bazar 9. Tesîr 12. Zimannasekî kurd... Zîlan
14. Notayeke muzîkê 15. Gelekî qedîm ê Rojhilata Navîn
17. Dewarê nêr 18. Bersiva neyênî
22. Sehkirina bi guhan

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Pîrek, afret, kuflet
2. Fikir
3. Cejin
4. Vexwarina sereke
5. Mîr , serokê êlê
7. Zaravayekî kurdî
8. Awayê berdana mirîşkê
10. Teref, hêl
11. Navê xelîfeyekî...Bin Xetab
13. Dengvedan.
14. Nêçîrvan
16. Destvekirî, camêr
19. Parêzerê Nilson Mandela,...MÛSA
20. Derd
21. Sewaleke kedî ji bo goşt û hiriyê tê xwedîkirin
23. Cihê ku genim lê tê hêran

## Bersiva hefteya borî



# Çima kapîtalîzm alîkariyê dide berhemên ku wê rexne dike?

Navenda Nûçeyan

**Di vê sedsala dawî de gelek filmên ku pişta xwe didin rexnekirina li kapîtalîzmê derketin holê. Wekî mînak Squid Game jî yek ji van filmê ku li dijî kapîtalîzmê ye**

Di cotmehê de xwediyê şirketa Amazonê Jeff Bezos li ser hesabê xwe yê twitirê got: " Ez gelekî bi kelecan li hêviya dîtina leystika (Squid Gamê) me"

Rêzefilmê (Squid Game) ku şirketa Netflix a Koreya Başûr weşandibû û piştî mehekê ji weşanê 111 milyon kesan lê temaşekiribû. Bi gotineke din li gorî hejmara dîtinan ew di rêza yekemîn de bû.

Wekî tê zanîn ew rêzefilmê ji 9 xelekan pêk tê, rexneyan li civaka kapîtalîst dike. Di rêzefilmê de 456 leystikvanên ku di rewşeke gelekî xerab û di nava xizaniyê de dijîn, cih digirin. Ew bi wê yekê dixwazin civaka heyî berbiçav bikin ku tê de armanca sereke û bi her şêweyî danehev û berhevkirina mal û pereyan ne.

Di vê sedsala dawî de gelek filmên ku pişta xwe didin rexnekirina li kapîtalîzmê derketin holê. Wekî mînak filmê Snowpiercer (2013), Okja (2017), Nomadland (2020) û hin filmên din. Lê piştî ku filmê (Parasite) ê Koreya Başûr hêjayî xelata Oscarê hate dîtin êdî ew bû destpêka guherînekê ji bo karên hunderîn ên ku rasterast kapîtalîzmê rexne dikin.

Li ser vê mijarê sînemager û rexngirê misrî Emced Cemal di axaftineke xwe ya ji BBC'yê re wiha gotibû: " Filmên ku kapîtalîzmê rexne dikin ne tiştekî nû ye." Cemal filmê amerîkî (The Devil and Miss Jones) ê ku di sala 1941'ê de hatibû weşandin, wekî



mînak destnîşan dike. Cemal dibêje: "Dema min ew film dît ez matmayî mam, çawa filmeke wiha dikare hemû neyêniyên kapîtalîzmê bîne ziman."

Emced Cemal li ser filmên ku bi demê re bi şêweyên cuda derketine holê jî wiha dibêje: "Filmên wekî filmê The Platform ê spanî (2019), filmê Sorry To Bother You (2018) yê amerîkî û hin filmên din di rexneyên xwe de şêweyê metaforîk bikar tînin."

Wekî mînak cil û berg û berhemên ku di filmê Squid Game de hatibûn bikaranîn piştî ku ewqas zêde li ser Netfilixê hat temaşekirin, bû sedema ku firotina wan cil û bergan û tiştên di wir de hatine bikaranîn, gelekî zêde bibe. Lewre jî mirov dikare bibêje kapîtalîzim dikare sûdê ji reklama li dijî xwe jî bibîne, tevî ku hin rexne lê tên kirin lê dibe sedema firotina berhemên wê jî. Ji aliyekî din ve jî radîkaliya ramana rexneyê ji holê radike û wiha dê bandora wê rexneyê jî bêtir bibe.

Mirov dikare heman tiştî ji bo medyaya dijîtal jî bibêje. Wekî mînak hin kes dilê xwe di medyaya dijîtal de rihet dikin, rexneyan dikin, çêran dikin, guhertinên mezin û şoreşan dikin lê ew tev ne rasteqîn in.

Wekî hingivê tu ji paş camekê zimanê xwe lê bidî û bibêjî çiqas xweş û şîrîn e. A rast tu tenê zimanê xwe li camê didî, hingiv li aliyê din ê camê ye lewre jî ne tama wê dizanî ne jî çêja wê digirî.

## Ev 40 sal in stran û filmên kurdî arşîv dike

Îbrahîm Elî Sabir bi nasnav Îbrahîm Xurmalî ev 40 sal in stranên klasîk û filmên kurdî arşîv dike. Îbrahîm Elî Sabir ji sala 1977'an ve li bajarokê Xurmalê yê ser bi parêzgeha Helebceyê ve bi arşîvkirina stranên kilasîk û filmên Kurdî mijûl dibe. Heta niha 7 hezar û 500 kasedên stran û filmên kurdî yên her çar parçeyên Kurdistanê arşîv kiriye.

Îbrahîm Elî Sabir der barê arşîvkirina çanda kurdî de wiha got: "Xwesteka min ew e ku bikaribim hemû stranên çanda kurdî, bi taybetî stranên kurdî yên resen kom bikim. Bi vê xwestekê ji sala 1977'an ve min dest bi komkirin û arşîvkirinê kiriye. Xwesteka min hatiye cih û min kariye heta niha ji sedî 90 stranên klasîk ên kurdî li cem xwe kom bikim."

Elî Sabir diyar kir ku di nava arşîva wî de ji hemû parçeyên Kurdistanê stranên hunermendên kurd hene û wiha domand: "Me çandeke dewlemend heye, dewletên herêmî gelek stran û awazên kurdî birine û xistine malê xwe. Ji ber ku ew dewlet in û derfetên wan hene ji xwere dikin mal. Wekî mînak; sirûda niha ya Tirkiyeyê sirûda Hesen Zîrek e ku di sala 1969'an de li Bexdayê tomar kiriye. Navê sirûda wî jî 'Ey Kurdîne ey merdîne.' Heman awaza Hesen Zîrek li ser danîne."

Îbrahîm da zanîn ji bilî 7 hezar kasetên stranan, 500 kasetên bi dîmen ku di dema xwe de ji televîzyona Kerkûkê ya berê girtiye, niha li cem wî hene.

Di berdewama axaftina xwe de Îbrahîm Elî Sabir da zanîn ku di vê dema teknolojiyê ya pêşketî de divê çanda kurdî were pêşxistin, parastin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Dagirkerên Kurdistanê hertim dixwazin çand û hunera kurdî tine bikin. Bi taybetî ciwanên kurd divê xwe ji çanda biyanî dûr bixin û girîngiyê bidin parastin û pêşxistina çanda kurdî. Ji ber ku dema çand û hunera gelekî nebe nasnameya wî gelî jî tune ye." ***SILÊMANÎ***

LI STENBOLÊ DEM DEMA HDP'Ê YE
HDP
LI STENBOLÊ DEM DEMA HDP'Ê YE
HDP
KONGREYA 4'MÎN
A ASAYÎ YA STENBOLÊ
BANGAWAZÎ
BEŞDERVAN:
Hevserokê Giştî
Mithat SANCAR
MUZÎK:
*Koma Ma Muzik
*Bajar
Yahya Kemal Beyatlı Gösteri Merkezi
KÜÇÜKÇEKMECE
12 BERFANBAR YEKŞEM
11.00

xwebûn

13-19 Kanûn 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 104

*İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:* Kadri Esen
*Sorumlu Yazıişleri Müdürü:* Elif Can Alkan
*Yayın Danışma Kurulu:* Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
Munewer Azîzoglu Bazan
*Yayın Türü:* Haftalık Yaygın Süreli

*Yönetim Yeri:* Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
*Baskı:* Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***


*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Bajarê medan yê wenda; Pterîa/Kerkenez



Keştiya Alalû
Agît Yazar



Bavê dîrokê Heredot ê Îonyayî di berhema xwe ya giranbuha ya bi navê Dîrokê de, qala bajarekî Medan yê li Anatolyaya navîn dike. Navê xwe Pterîa/Pteriya ye. Ji ber ku ev serê du hezar û 500 salî ye, cihê vî bajarê girîng nedihat zanîn. Lewma jî alema arkeolojiyê ev bajar wekî bajarê xeyalî pênase dikir. Lê ev serê sîh salî ye, êdî cihê vî bajarî tê zanîn. (xebînete, ji bo me kurdan, hîn jî nayê zanîn) Ev bajarê mezin yê Împaratoriya Medan(kurdan), li herêma Kerkenez a bi ser navçeya Sorgun a Yozgatê ve ye. Navê xwe yê niha, nola "kavilên kerkenezê" derbasî zimanê arkeolojiyê bûye (kerkenez, yan jî kergez, navê balîndeyekî ku dişêbe başokê û ev navekî kevn ê kurdî ye. Ev balînde, moz û kêzikan dinêçêrîne. Tirk, vî navî bi kartînin. Lewma jî ji me weye ku ev navekî bi tirkî ye. Me jî ev nav ji wan re hiştiye û em niha ji vî balîndeyî re dibêjin lûrteşî, dûvteşî û hwd. Her wiha navê Sorgunê jî bi kurdî ye. Dibe ku ev nav ji serdema kurdên cîhana dêrîn yên Hattî-Hîtît û Medan hatibe roja me ya niha...)

Ev bajarê ji bo me pir û pir girîng, bajarê Împaratoriya Mediya yê li hêla rojava, bajarê herî dûr e. Dirêjahiya dîwarê sûra bajarê Kerkenez/Pterîa, zêdeyî heft km dirêj e. Berahiya dîwêr metreyek û nîv e, her wiha du metre û nîv û heta heft metre jî bilind e. Heft deriyê bajêr hene. Ev bajarê mezin yê xwediyê zir-sûreke dirêj, hemû cûreyên avahiyê jîngehî di nava xwe de dihewîne.

Cara pêşîn di sala 1928'an de kolandina arkeolojîk li vê derê dest pêkiriye. Hingê dihat texmînkirin ku ev bajarekî Asûran bûye. Paşê di sala 1993'yan de kolaneke nekûr hatiye kirin. Di vê kolandina dawî de hat zanîn ku ev bajarê Medan yê ku Heredot behs dikir, ew bajar bi xwe ye. Lewre nîşanên Heredot destnîşan kiriye û Kavilên Bajarê Antîk yê Kerkenezê, yek bi yek hevdu digrin û cih ji şikê re nahêle. Lê wekî her car, rayedarên dewletê ketibûn pey şêlokirina girîngiya vî bajarî.

**Keyxusrew ê mezin û bajarê Pterîa/Kerkenez**

Keyxusrew ê mezin, B.Z 628-585 derdikeve ser textê keyatiyê yê Medan. Keya Keyxusrew, tekane ew keya ye ku di wexta xwe ya desthilatdariyê de tifaqa tevahiya hozên kurdan dike yek û di bin sîwana Împaratoriya Medan de digihîne hev. Keyxusrew, neviyê keya Diyako û kurê keya Fireoştre ye. Hêj Keyxusrew mîrze bû, bavê wî di şerê li hemberî Asûran de tê kuştin. Keyxusrew dikeve dewsa bavê xwe Fireoştre. hozên kurdan/Medan yên jihevbelavbûyî, tîne ba hev. Piştre li asûrên xedar yên dijminên bav û kalên kurdan vedigere û B.Z di sala 612'an de diçe ser Nînowayê û paytexta asûran di ser serê wan de hildiweşîne. Piştî hilê asûran dixîne milê wan û asûran di sergoyê dîrokê de binax dike. Êdî keyayê gewre Keyxusrew li skîtiyên talanker vedigere û serkêşên wan dîl digre, dest û lingên wan dixîne qeyd û leleyan, wan tînin pêşberî xwe û serî li wan diçimînin. Keyxusrew ê gewre, vê rewşa skîtî, kîmerî, asûrî û neyarê kurdan yên din bi giştî, li ser zinarê Behîston/Bihîstinê dikole û nemir dike (paşê di navbera salên 1913-1923'yan de persên/parsek, bi rolyefa Behîstonê dilîzin û mîna Daryûsê pêşiyên wan, ew rolyefa li ser wê latê hilkolabe, diniqirîne û lê zêde dikin)

Piştî keya Keyxusrew, tevahiya dijminê kurdan/medan têk dibe, hozeke skîtî xwe davêje bextê Keyxusrew, ji wî tîka dike, da ku ew wan bihewîne. Keyxusrew jî wê hoza skîtî li nêzî sînorê Împaratoriya Medan û cîranê wan ê lîdyayî bi cîh dike.

Keyê keyan Keyxusrew ew qas mirovekî şareza û zîrek bûye, wî tucaran karê xwe bi sersarî negirtiye û her wext bitevdir û tifaq tevgeriyaye. Lewma jî gava ew wê hoza skîtî li ser axa medan bi cih dike, ew naxwaze wan bi serê xwe serbest bihêle. Lewma jî keya Keyxusrew, çend zarokên kurd li ba wan bi cih dike. Da ku fêrî zimanê wan bibe û paşê li liv û tevgera wan serwext bibe. Lewra keya Keyxusrew, hem merivekî dilovan, hem jî merivekî bi hesab û kîtêb bû.

Gotineke me kurdan heye dibêje, gur eyarê xwe navêje. Skîtiyên nan û xwêya wan li guzikê, ji ciwanmêriyê fêm naikin û qencîyê naşêkirînin. Zarokekî ku bi fermana Keyxusrew ê mezin li ba wan bi cih kiribû, dikujin. Skîtî yên kujerê zarokekî medan/kurdan, pê dizanin ku keyê keyan Keyxusrew ew ê wê bêbaviya wan efû neke; ew ê diya wan bişîne kinca û qûşê li wan biqetîne. Lema jî ji tirsa Împaratorê kurd Keyxusrew re, tevahiya skîtiyan diqutifin û ji tirsa Keyxesrew, ew hoza skîtî direvin û xwe davêjin dexlê lîdyayî yên cîranên medan/kurdan.

Gava keyê keyan Keyxusrew dibîhîze ku skîtî yên tirek, xortikekî med/kurd kuştiye û reviyane xwe avêtine pişt lîdyayîyan, Keyxusrew dîn û har dibe. Yekser fermanê li lîdyayîyan radike û dibêje: "heke hûn wan skîtiyên bêbext radestî min dikin bikin, heke hûn nakin xwe ji şerê giran re amade bikin!"

Lîdyayî, wan skîtiyan radestî Împarator Keyxusrew nakin. Keyxusrew, artêşa xwe ya giran dişîne ser lîdyayiyên ku lingê xwe zêdeyî lihêfa xwe ramedandibûn.

Sînorê Împaratoriya Medan ji hêla rojhilat ji Hindistanê destpêdikir, ji hêla rojava jî xwe digihand heta Anatolyaya Navîn. Heke em xetekê ji Derya Reş ber bi Derya Sipî bikşînin, ew ê xwe ji Sînopa niha berde ser herêma bajarê Antalya ya niha. Jixwe Heredot û Strabo jî ev xet destnîşan kirine. Sînorê eyan yê di navbera van herdu bajaran de jî Çemê Helîs(Kizilirmak)ê ye. Aha ev bajarê Kerkenez/Pterîa ku mijara vê nivîsarê ye, tam di nîveka van herdu bajaran de hatiye avakirin.

Gava keyê keyan Keyxusrew şer li hemberî lîdyayiyan radigihîne, ew vî bajarê Kerkenez/Pterîa, wekî baregeheke leşkerî zexm dike. Lewre ev bajarê herî nêzîk ê sînorê herdu welatan e. Lema, bi fermana keya Keyxusrew, vî bajarê stratejik zexm dikin û sûreke mezin li dorê lêdikin.

Beriya Zayînê di sala 591'ê de, di navbera Împaratoriya Medan/kurdan û lîdyayiyan de şer destpêdike. Serkêşê artêşa medan, Mîrze Astiyag ê kurê keya Keyxesrew e. Yawerê Mîrze Astiyag, Harpago ye. Harpago, mirovekî ji herêma Meletê ye (Balkêş e ku Îsmetê Kerr-Îsmet Înunu jî ji heman herêmê ye. Dema li pêş, bi berfirehî ez ê li ser xayinê kurd yê herî mezin, Harpago binivîsim)

Bi salan şerê di navbera medan û lîdyayiyan de didome rojeke eyan a 28'ê gulana 585'an a B.Z nîvê rojê, roj tê girtin; roj tarî dibe mîna şevreşekê. Ji ber ku roj hem li ba kurdên medî yên Zerdeştî jî û li ba lîdyayiyên lowî jî pir pîroz bû, herdu gelên cîranên hevdu û her wiha xwediyê baweriyeke nêzî hev, li hemberî girtina rojê dibehitin.

Rayedarên herdu welatan dibêjin ev kerameteke xwedayî ye ku xwedê ji me hêrs bûye û xwedê jî êdî vî şerî napejirîne. Lewma jî roja xwe ya pîroz li ser me tarî kir. Heke em şer bidomînin, ew ê xwedê bitahne û ew ê xezeba xwe li me bibarîne.

Li ser vê qewimandina xwezayê ya rojgirtinê, herdu welat bi navbênkariya Babîl û Klîkyayê li hevdu tên. Li ser Keyayê Lîdya, Alayattes ê 2'em ferz dikin ku ew keça xwe ya bi navê Alayanîs a lîdî, ango lîdyayî li kurê Keyxusrew Mîrze Astiyag mahr bike. Her wiha Çemê Hêlizê(Kizilirmak) wekî sînorê navbera herdu welatan mîsoger dikin.

Împaratoriya Medan, vê peymana dîrokî li ser dîwarê aramgeha keyê keyan Keyxusrew, bi rolyef û sêwirandineke niwaze dikolin. Jixwe piştî vê peymanê salek derbas dibe, keyayê gewre, bavê kurdan yê mezin keyê keyan Keyxusrew, Împaratoriyeke mezin û bi hêbet ji kurdên medî re dihêle û serê xwe diavêje diyarê qebrê, axa kendal û gorê û derdikeve warê aşa.

Heke yek ji min bipirse bibêje, ji bavê Adem û vir ve, di nava pêşiyên kurdan de lehengê herî gewre kî ye, bêdudilî ez ê bibêjim ew lehengê gewre û yê hetahetayê, Keyxusrew ê mezin e. mala Dildar Şeko hezar carî ava be ku navê bavê mezin, bavê kurdan, keyê keyan Keyxusrew di nava marşa netewî Ey Reqîb de bi cih kiriye û ew kiriye şekirê li ser zimanan.

Di xelaka paş de, ez ê berê xwe bidim Slêmaniya rengîn û em ê bi hev re herin tewafa aramgeha keyê keyan Keyxusrew ê gewre û em ê bejna xwe ji Împaratorê kurd re bitewînin.



